

Uğur Mumcu kuştin

Komploya mezin

Rüpel 5



Kontrgerîla li her derê...

Kontrgerîla, li Kurdistanê û Tirkîyê, li dû lîstik û komployên mezin digere. Ji serê salê û bi vir ve, li Kurdistanê nêzîkî 20 kesî ji alî vê hêza dewletê ve hatine kuştin. Hedefen wan diyar nîn in. Li Tirkîyê jî, bi sükastan derê belayeke nû vedikin. Dewlet bûye du parce û krîzeke girs, xwe di hemû saziyên wê de, diyar dike.

Kontrgerîla di rojeva Tirkîyê de jî, cihê herî girîng digire. Guftûgoyên li ser vê hêzê di hemû qadêن Tirkîyê de didomin. Li Kurdistanê, ji bo tunekirina vê heza kontra şervanên Kurd, di êrîşê de ne. Li Diyarbekir, Farqîn û Batmanê, derbeyên xedar li vê hêzê dane. Divê gel jî, di vê têkoşînê de cihê xwe bigire.

Rüpel 8



Ez, sergîn û axa sor / Didim ser hev dor bi dor / Dibe xêni û ez tê de / Ci bê pace û ci jî kor.



Dr. Vera
Beaudin
Saeedpour

Rüpel 11



Hevpeyvînek
bi Lamara F.
Paşayêva re

Rüpel 6



Çirok
Hêviya
Hêvîn

Rüpel 13

REWS



Abdullah Keskin

Xwedîderketina welêt

Wexta ku Uğur Mumcu (nivîskarê rojnameya Cumhuriyet) hate kuştin, wekî ku Apê Musa ji nû ve carreke din bê kuştin. Em Kurd çiqas bê xwedî ne. Em çima ewqasî ji mirov û civaka xwe re biyanî ne?

Apê Musa kutubxaneyeke li ser piyan bû. Şahidê Kurdistana sed-sala 20'an bû. Ji bo Kurd û Kurdîtiye çiqas tade û eziyet dît?

Daxwaza wî ya herî mezin û dawî di riya Kurd û Kurdistanê de mirin bû. Ew gihîste daxwaziya xwe. Lî em? Me piştî wî ci kir? Em Kurd çiqasî li bîranîna wî xwedî derketin? Me çiqasî riya wî şopand?

Cendekê Apê Musa jî, ji me re gelek dîtin. Nehîştin ku gel bi Apê xwe şad bibe, wezîfeya xwe ya dawî bîne cih. Cenazeyê wî bi dizî revandin û veşartin.

Apê Musa di saxiya xwe de ge-

lek ji wan kişand. Canê wî yê bêrih ew bêhtir tirsandin. Ji çinara 77 salî ditirsiyan. Ji porê wî yê spî ku di nav xwînê de mayî, ditirsiyan. Ji tirsê ditirsiyan. Tırsa xwe veşartin.

Ji bo Uğur Mumcu bi sedhezaran însan derdikeye sikak û kolanın. Xelkê wî li doza wî xwedî derdikeye. Em çiqasî li xwe û pirsgirêkên welat û gelê xwe xwedî derkevin?

Axa mirinê bi ser civaka Kurd de rijandine. Bi tırs û darê koteke meijîyê însanîn me ji xwe re êsîr girtine. Em ji vê esaretê westîyan, bes e.

Cînayeta Uğur Mumcu, gelek rastiyân jî zelaltır dike. Li gor dewleta Tirk û çapemeniya Tirk, yekîti û biratiya Kurd û Tîrkan jî çîrokeke tîjî durû pê ve naye tu maneyê. Ev çend meh in ku, li ser yekîti û biratiye nutuq davêtin, ew dem jî derbas bû.

Cînayeta Uğur Mumcu, gelek rastiyân jî zelaltır dike. Li gor dewleta Tirk û çapemeniya Tirk, yekîti û biratiya Kurd û Tîrkan jî çîrokeke tîjî durû pê ve naye tu maneyê. Ev

çend meh in ku, li ser yekîti û biratiye nutuq davêtin, ew dem jî derbas bû.

Musa Anter di nefesa xwe ya dawî de jî, biratî û wekheviya gelan diparast. Heta 77 saliya jiyana xwe jî, ji bo van armancan têkoşin kir û ji bo vê armancê serê xwe danî.

Ew ên ku iro ji bo "azadiya çapemeniyê" diqîrin ji bo deh rojnamevanen Kurd bê şik ku ji aliye hêzên dewletê ve hatin qetilkirin, ci kirin? Hê jî rojnamevaniya wan muhasebe dikin. Di nav salekê de, di sala 1992'yan de zêdeyi 400 însanê Kurd hatin kuştin. Ji bo van însanan ci kirin? Iro li Kurdistanê Kurdîtî sedemê îşkencê, girtin û kuştinê ye. Demokrat û pêşverûrûn Tirk ji bo vê ci kirine û ci dikin?

Van salên dawî rastiyekê da xuyakirin. Wexta mirov li xwe, li welat û gelê xwe û pirsgirêkên xwe xwedî dernekeve, tu kes, tu hêz û dewlet ji bo xatirê mirovahiyê li wan xwedî dernakeve. Xwedî derketina welêt divê ji can û dil be. Wî çaxî mirov dikare di nav civakên dînyayê de serbilind bijî.

Em çiqasî li welât xwe xwedî derkevin, emê ewqasî li şehîdên xwe jî, xwedî derkevin.

FERHENGOK

- Aşit: Şepe (Çığ)
- Bandor: Hikari, poside, tesir
- Beroş: Quşxane (tencere)
- Bîranîn: (Hatira, anı)
- Cendek: Term, meyit, cenaze
- Cerd: Avêtina ser derekê (baskın)
- Çapemeni: Press (Basın)
- Çê: Qenc, baş
- Devang: Devik, qalpax
- Dilzîl: Kesî bi hisiyat (duygusal)
- Fesal: Di modayê de pivan (ölçü)
- Gencine: Xezîne
- Gengesî: Guftûgo, munaqeş
- Hindikahî: Egalite (azinlik)
- Hingavtin: İskence
- Kozik: Mewzi
- Lêzim: Eqrebe, xisim
- Mêtin: Mijandin (emzirmek)
- Misoger: Heqîyat, garanti
- Misyon: Peywir, wezîfe
- Mital: Raman, fikir, hizir
- Necirandin: Niqîrandina dar û textan qewartin (oymak)
- Nependi: Veşarı
- Nîr: Aletê ku dixin stûyê dewaran û pê cot dikin (Boyunduruk)
- Noker: Xulam, hevkar (uşak, işbirlikçi)
- Numayış: Xwepêşandan (gösteri)
- Pejirandin: Qebûkirin
- Pest: Pêkutî (baskı)
- Pêşangeh: (Sergi)
- Pirsgirêk: Gelş, gelemeş, problem
- Pisavtin: Asîmîkirin
- Qaneh: İqna
- Quntar: Quntara çiya (dağ eteği)
- Serpêhatî: Serborî (Macera)
- Sift: Sixlet, gurr, tîr (yoğun)
- Sixur: Ajan
- Şad: Bextewarî, bikêfbûn (mutlu)
- Tax: Tar (mahalle)
- Teqez: Mutleq (kesin)
- Tîr: Tîra kevan, aleteke şer (ok)
- Vejandin: Bicankirin (diriltmek)
- Xwepêşandan: Miting
- Zenî: Erçen (Çene)
- Zinhar: (Sakin)

Nîvis ú nûcîyên li ser rewşa weşanen Kurdi deng da. Heta niha gelek nîvis jî me re hatin. Nîvisa Ziya Şeker jî alîyê xwendevanan ve şirove dike. Em diweşînin.

Rojnameya Welat li ser pirseke giřing lêkolîn û legerînek çêkiriye.

"Xwendevan li Kurdi xwedî dernakevin." Ev lêkolîn û legerîn di du hejmara de li dû hev hat weşandin. (Hej. 40,41) Abdullah Keskin jî di quncikê xwe de dest avete wê pirsê. Li ser rewşa "Weşanen Kurdi" disekine. (Hej. 41).

Dû re Amed Tigris "Ma ne şerm e?" disekine (Hej. 43) û Rûken Baxdû "1992: Weşanen Kurdi gelek qels derketin, Hej. 47) jî li ser vê pirsê sekinin.

Ev lêkolîn û legerîna ku rojnameya Welat çêkir û rewşa ku derket holê dilê min êsand. Weşanxaneyen ku hêdi hêdi dev ji weşanen Kurdi berdidin dilê min êsandır.

Divê li ser vê pirsê bi dostanî bê mijûkirin. Ev dabaş di nav civaknasiya wêje (edebiyat sosyolojisi) de cihê xwe digire. Civaknasiya wêje, li ser pirsên weşanen û xwendevanan disekine. Li ser xwendevanan kijan hêmanen (faktör) civaki bandûr dike? Xwendevan çi dixwinin û ci naxwinin? Kî dixwinin? È ku xwendevan nêzîki pirtûkan dike ci ye, yê dûr dixe ci ye? Ci, xwendevan û pirtûkan tîne ba hev? Ev pirs dibê pirtir jî bibin.

Pirsgirêk bi "Xwendevan li Kurdi xwedî dernakevin" ve bê girêdan bi min ne çewt e, lê kêm

e. Di civaknasiya wêje de ev pirs bi çar holê xwe hene. Niviskar û pirtûk, weşan û weşanxane, belavkirin û xwendevan. Hêmana vana li hev girêdanê jî; reklama navendî ye (ortam), qelite ye, hewcebûnî ye, danasîn e û hwd.

Helbet dabaş Kurdi ye. Lî divê hêmanen dewletê jî neyên jîbirkirin. Ez dixwazim li ser çen nuqtayen pirsan bikim.

1. Weşanxane pirsgirêkên xwe yên aborî hel kirine? Li mesela Kurdi çawa dinêrin? Bi niyeta bâzirganiye an na? Armanca wan ci ye?

2. Weşanxane li ser teknika pirtûkan disekinin an na? Qimetê di din naveroka pirtûkan? Li ser vê meseleye serê xwe dişenin?

3. Weşanxane qet legerîn çêkîrine? Pirtûk bi pirranî li ku derê tên firotin? Li bajaran an li gundan? Li Kurdistanê an li metropolen Tîrkiyê? Li Diyarbekirê an li Stenbolê? Li Enquerê an li Qersê? Li İzmirê an li Hekariyê? û hwd. Kî pirtûk dixwinin? Mamoste an şagirt? Burokrat an karker? Xort an pîr? Jin an mîr? û hwd.

4. Kijan pirtûk û çîma pîrrir tên firotin? Çîma pirtûken bi Tîrki 2000 heb tên firotin lê yên bi Kurdi 500 heb tên firotin? Mesela "Rîsala Biratiyê" ci kiriye 4000 heb firotiye? Weşanxaneyen ku

rûpelekê nagire. Di rûpelê de ji çaran yek cih dane wan. Ev nîvisen li ser pirtûkan yên pîr yê Hüseyîn Deniz in. Hüseyîn Deniz 7, J. Espar 4, Salar Amedî 3, Murat Ergin 2 nîvisen xwe hene. Nîvisen bê destnîsan jî pîr in. A. Keskin, Mazhar Günbat, Bêrîvana Dêrsimî, Amed û hwd.

Di vê nuqtê de kêmasyek heye. Qet nebe divê di Welat de rûpelek jî bo danasîna pirtûkan hebe. Divê ku nîviskarîn rojname û kovaran dest deynin ser vê meselê. Di her rojname û kovarê de, divê rûpelek jî bo pirtûkan hebe.

Pirs: Weşanxaneyen Kurdi çîma dev ji weşanen Kurdi berdi dinîn?

Bersiv: Pirtûken Kurdi nayen firotin. Xwendevan li Kurdi xwedî dernakevin.

Xwendevan: Bersiva we dilê min dişenine, dilê min dişenine... Ez xwendevanê ku, 70 sal e ku zimanê wî qedexe ye. Pişivîme. Standartî tune. Her pirtûk ji bo gramer û ziman tiştekî dinivise. Kijan çewt e kijan rast e?

Ferheng, heryekê bi awayekê ne. Pirtûken ku em li wan digerin li pirtûkxaneyen peyda nabin. Meseleyen me yên aborî jî hene, lê ne giřing e. Li ser me jî zordesiya dewletê heye. Lî mixabin ji van bêhtir, hin pirtûk hene ku mirov rûpelên wan vedike, tu dibê qey ji

mirov re dibêjin "Min nexwîne! Ez ne zimanekî baş im, rind im û zelal im!..."

Di dawîya lêkolîn û legerînan de xuya dibe ku mesele ne mesela li Kurdi xwendîderneketinê ye. Xwendevan li Kurdi xwedî derketiye. Pirtûken ku li ser mesela Kurdi hatine weşandin hatine firotin. Ev jî nîşan dide ku xwendevan li mesela Kurdi xwedî derketiye. Lê mixabin gelşê xwendevanan ji alî devokê ziman ve hene. Ev, ji bo weşanxane û xwendevanan giřing e. Divê ev tesbîta Rûken Baxdû ya "Berpîrsiyariya hin weşanxaneyen xwendevanan dûr kîrin, dûrbûna xwendevanan ev xebat ji rojê hilanî. Bi vî awayî daireke fasît çêbû. Ev çûyîn ber bi armanca dewletê ve diçe" bê şikestin. Lewma ji helbesta Ahmed Arîf "Enedol" parçeyek tê ber devê min.

"Bibîne
Çawa ji nû ve têm afîrandinê,
Bi desten te yê
Ciwan û bi xiret
Keçen min,
Lawen min hene
Di pêşerojê de,
Heryek parçeyek cihanê yê
jêneper
Konça çend hezar sal hesreta min
Di çavên te de
Di çavên te de radîmîsim.
Tu yî
Tu têdigîhî?
Ziya Şeker



Maliyeta şerê li Kurdistanê

Hikûmet û serleşkeriya Tirk, di şerê li Kurdistanê de, sînor nas nakin. Mesrefen leşkerî, yên ji bo 1993'an di şerê li hember gerîla projeyên wan hatine amadekirin, butçeya 1993'an du qat dîkin. Her bombe avêtineke balefirân ji 350 milyonî dibuhure. Li gor beyana serleşkeriya Tirk, balefirên wan, di şerê başûr de 450 sortî pêk anîne. Ev jî, nîşan dide ku, tenê maliyeta rabûna balefirân ji 157 milyar û 500 milyonî derbas bûye. Di nav sala 1992'an de, di tixûbê Iraqê de 35 qereqolên nû ava bûne. Maliyeta her qereqolî ji 2 milyar e.

Ercan Kılıç

Maliyeta leşkerî yê şerê li Kurdistanê butçeya Tirkîyê yê 1993'an du qat dîke. Serleşkeriya Tirk û hikûmet, ji bo ji vî şerî serfiraz derkevin, mesrefen ku hişê mirov nagire dane ber çavén xwe. Wezirê Parêzgeriya Neteweyî Nevzat Ayaz, di beyanê xwe de, da xuyan ku ji bo modernîzasyona artêşa Tirk pêdîvi (ihtiyac) bi 500 trilyonî heye. Di gel vê yekê, peymanê ku bi bazirganen çekan ên navneteweyî re têne çêkîrin û bikaranîna van çekan li Kurdistanê, maliyeta şer derdixe holê.

Bi firmaya Skorsky re, di nav vê salê de ji bo li Kurdistanê li hember gerîla bêne bikaranîn peymana standina 75 firokeyî (helikopter) hate imzekerin. Maliyeta van helikopteran 66.4 milyar lîra ye.

Di sala 1992'an de, 90 hezar

mayin, li sînorê Iraqê hatin raxistin. Wekî din, di nav salekê de, di sînor de, 35 qereqol ava kirin. Maliyeta her qereqolî ji 2 milyar e.

Li gor çavkaniyê cur be cur saetek li hewamayîna her firokeyê 1500–2000 dolar digire. Wekî din lînérîna hefteyekê yê firokeyan ji, 400 milyon pereyê Tirk dibîne. Buhayê her tanqekê 5 milyar û 400 milyon e. Her gulleke 63 an ji 10 hezar e. Buhayê kaleşnikofan ji gihîştiye 4 milyonan. Li gor hin agahiyan, tenê li Şîrnexê hejmara gulleyen ku hatine şewitandin milyonek e. Tenê li Mûşê îsal 15 heb qereqol ava bûn. Buhayê her dûrbîneke şevine ji 700 milyon e.

Di nav hêzên dewletê de, bi tenê tezmînata rêveberiya taybeti ji bo serbazan 100 milyar digire. Li gor nûçeyâ rojnameya Günaydin, buhayê firokeyen ku dê ji

Rûsyayê bêne standin 300 milyon dolar e.

Buhayê elekek ji pola 420 dollar e. Ger mirov 14 hezar polis û 83 hezar cendirmeyen li herêmê bide ber çav maliyeta van élakan digihîje 300 milyarı. Li gor hin çavkaniyan, her sortiyeke balefirân ji dewletê re bi 350 milyonî dibe mal. Li gor beyana serleşkeriya Tirk, di şerê dawî yê başûr de, 450 sortî pêk hatine. Di vê operasyonê de, tenê rabûna balefirân 157 milyar û 500 milyonî bûye mal. Di gel vê yekê, serleşkeriya Tirk, di beyanê xwe de, idia dikir ku 2000 gerîla hatine kuştin û hesaba maliyeta kuştina her gerîlayekî ji, bi awayekî hovane dikirin. Wekî din, maliyeta cerdevanan ku ji 1985'i vir ve li hember gerîla hatine birêxistin, gihîştiye 2 trilyon û nîvî. Tazmînata herêma rêveberiya taybeti ku didin nêzîkî 100 hezar karmend û rayedarên dewletê, ji milyaran bîhuriye. Wekî din, gelek tesîsên ku ji ali hêzên dewletê ve hatin işxalkirin ji, maliyeta vî şerî zêde dîke. Hin mesrefen ku li herêmê têne kirin, ji hin fonan têne standin, weke fona parêziyê, lê ev mesref, eşkere nîn in û wek hejmar nayêne zanîn. Di sala 1991'an de, idareya Tekelê 259 milyar lîra daye vê fonê. Idareya Piyangoya Mili ji, 100 milyar daye.

Li gor nûçeyen çapemeniya Ereb, Tirkîye di van salên dawî de, 12 projeyen çekstandinê pêk anîye û maliyeta vê ji 10 milyar dolar e.

ARGK Yildirim Merkît kuşt

İtirafkar Yildirim Merkît di 24.1.1993'an de li bajarê Brîla yê Romanuya, saet li derdora 18.45'an ji aliye gerîlayen ARGK'ê ve hate kuştin. Yildirim Merkît di meha Mîdarê ya 1979'an de bi Mazlûm Doğan û Aysel Çürükkaya re hatîb girtin.

Li gor daxuyaniya KURD-HA'yê (Ajansa Nûçeyan a Kurdistan) li ser itirafkarina Yildirim Merkît 34 şoreşer di zindana Amedê de têne kuştin. Li gor beyanê kesen ku ew nas dîkin; Yildirim Merkît û Şahîn Dönmez têkili bi Amîre Ewlekariya Hundir û zindana Amedê Esat Oktay Yildiran re danîne û bi Ömer Yorulmaz ku balefirê re vandibû Amedê û Yılmaz Yalçiner re ji bo pêkanîna hemû cureyên işkencayan xebitîne. Û itirafkariyê di nav girtiyan de gesandine.

KURD-HA da xuyan ku Esat Oktay Yildiran û Şahîn Dönmez ji, ji aliye gerîlayen bajêr ên ARGK'ê ve hatine kuştin.

HAWAR

Dilbixwîn

Eger tu dixwazî bibî “nivîskar” here çend rojan li Swêdê bimîne

Bê guman serîvisâ vê gotarê bala mirov dikişine ser xwe. Bi vê balkêşiyê re pirsek xwe davêje holê, ji miroveki ku bixwaze bibe nivîskar, Swêd ci derfet û îmkânîn peyda dîke? Eger wisa be, ev ci cure nivîskarî ye?

Dibe ku ji bo hinekan ev gotara min weke çirokekê be, lê ev çirokeke rastînî ye. Çirokên wiha rastînî tenê li welatê “nivîskaran” li Swêdê têne dîtin, çiroka “nivîskarîn” ne nivîskar.

Ji bo çareserkirina hinek pirsên teknikî yên girêdayî Kovara Rewşen (Organa YRWK-Hejmara Taybetî) ez berî vê bi çend rojan cùm Swêdê. Bi rastî ez nikarim ji we re mîna hinek “cemêran” pesnê Swêdê bidim û bibêjim cineta dînyayê. Min ji bîlî çend kolanan tu deren Stockholmê nedîtin. Di wê hefteyê de min rewşa ew kesen ku xwe avêtine meydana nivîskariyê baş nas kir. Ji nêzik ve min ew kesen ku cihê bêhnok û xalan ji hev nakine der, baş nas kir.

Li ser vê bingehê ez disa gotina xwe dubare dikim û dibêjim: Eger tu dixwazî di şev û rojekî de bibî “nivîskarek” ku kesek “pirtükîn” lê nexwîne û tîraja wan qulekekan negîhê 100 nimûneyî, fermo tu dikari biçî mala “nivîskarîn” navdar (meshûr) Stockholmê. Li wir hemû derfetên çapê peyda dîbin, bi wan derfetan tu bi hêsanî di riya nivîsandina tiştonekan re bibî “nivîskar”.

Bûyera herî balkêş ci ye?

Li Swêdê her Kurdeki ku dizane kumikan deyne ser tipa (e) û navê xwe bi tipen gîrs binivîsine “nivîskar”. Ne tenê “nivîskar”, hem “nivîskar” e, hem xwedan “weşanxane” ye, hem xwedan “pirtükxane” ye... Maşellah her tiştik e. Ji min nepîrsin, navnîşana wê weşanxaneyê ci ye, li navnîşana mala wan bipîrsin bes e. Ji ber ku navnîşana Weşanî êrî ku dertînîn, a mala wan e. Bi rastî mirov li van “nivîskarîn qehrîman” ecêbîmîyî dimîne.

Min gelek “pirtükîn” ku ji pirtükxaneye “nivîskarîn” wan dernekete li Swêdê dîtin. Tu wan keşkûlan li derveyî çend taxên Swêdê nabînî. Tenê li cem çend “ehbab” û “dostan” têne dîtin, ew ji, ji şerman re birine. Werin em carekê nav li wan bikin nivîskar, lê emê bipîrsin, çawa bûne nivîskar.

Niha her kesek ketiye hawîrkana fîrbûna dateyê (kompitur), melbatê tev dişine kursê, heyâ bi jîna xwe ji. Pişti ku hîn dîbin, tiliya xwe deynin ser tipan, li bayê bezê nivîskarî me yê “birêz” diçê li cem nîvmamosteyekî xwe hînî ABC ya Kurdi dîke. Hînbûna nivîsandina Kurdi gelek hêsan e, kumikan deyne ser tipan û her tişt diqede.

Nivîskarîn me, pişti ku ew, zarok û jîna wî hîn bibin hevokêni Kurdi bi rînîvisa Tirkî binivîsinin, edî dest bi nivîsandina pirtükân dîkin, ku layîq in xelata Nobelê bistînîn.

Jin li ser kompiturê, zarok li ser derbûkê û nivîskar ji pipo xistiye devê xwe, di hundir de diçê û tê, ji nişkî ve disekine û diqire: Min dît...! Lawo derbûkê germ bike, jînîk binivîsine.... Ev ji bo jiyanâ min e, emê wê li ser bergeyê deynin. Nivîskar, jiyanâ xwe tev di bin işkencê de derbas kirîye, şoreşeriya wî ne kêmî ya Che Guevara bûye, heya dawîyê, ji malbateke welatparêz û qehreman bûye. Tu caran nivîskar teslim ne bûye. Teslimkarî karê teslimkaran e... Ji ber zîma dîmin nivîskar niha li Stockholmê dimîne, (5) zarok û (2) jînîn wî hene.


Tu hew dîbinî ku di şev û rojekî de çend çirok-mîrok kom kirin, di nava du bergeyan de veşartin, navê weşanxaneyeye xeyali lêxist û di berbanga roja din de, cû li ber deriyê saziya alîkariya van kesen ku bi kelepora Kurdi dileyîzin, dîkin. Pişti mehekê bi hezaran distîne. Hem toreyâ me ser-binî hev dîke û hem ji kronen xwe distîne. Ez dibêjim ne pêdîvi ye ku ji we re qala naveroka pirtükê ya hunerî û babetî bikim, eger pêdîvi hebe, ez dikarim di hejmareke din de hinek pirtükân binirxînim.

Di vî warî de divê herkes hayîdar be, her keşkûlen ku derdikevin cîdi negire.

Greva birçibûnê ya bêdawî dest pê kir

Yekda Welat

Endamên Meclisa Neteweyî ya Kurdistanî li Ewrûpa li dijî hin-gavtin û qirkirina gelê Kurd, di 24'ê Çileye 1993'yan de dest bi greva birçibûnê ya bêdawî kirin. Nêzîkî 600 welatparêzên Kurd li Ewrûpa bi awahiyeke piştgirtinî besdarî greva birçibûnê bûne. Herwiha li dewleta Avustralya û Kanada jî dest bi grevén birçibûnê bûne. Ev bû-yer weke di sala 1992'an de, ku li Bruksel 40000 mirov besdarî rêveçûnê û 60000 besdarî festîwala Kurdistanî li Bochum/Almanya bûn, her wiha ev bû-yer jî, wê cihê xwe di nava dî-roka Kurdistanê de bigire. Cara yekemîn gelê Kurd bi hejmareke wiha mezin li Ewrûpa dike-ve greva birçibûnê. Ev jî nîşaneke herî mezin e ji bo tevgera serxwebûn û azadiya Kurdistanê. Roja 26'ê Çile 1993'an Mebûsên Meclisa Neteweyî ya Kurdistanî civîneke çapemeniyê çekirin. Di civîna çapemeniyê



Xwendevanê me Hüseyîn Akmeşe ji bo Meclisa Neteweyî ya Kurdistanê ji me re ji girtîgeha Kemalpaşa / Izmir şand.

de 3 mebûsên dewleta Belçika cihê xwe girtin û gotin ku wê bi xwe 3 roj ji bo piştgirtina mebûsên Kurd bikevin greva birçibûnê. Di civîna çapemeniyê de hate diyarkirin ku, dewleta Tirk di sala 1992'an de rekora li dijî mafê mirovahiyê şikand. Berpirsiyare civîna çapemeniyê yê Meclisa Neteweyî ya Kurdistanî li Ewrûpa wiha

got: "Di sala 1914-15'an de nêzîkî 1.5 milyon Ermenî ji aliye dewleta Tirkîye ve hatin qirkirin. Herwiha di sala 1916-20 an de; 300000 Pontus, di sala 1920'an de; 100000 Yewnan, di sala 1925-38'an de; 140000 Kurd, di sala 1974 an de; 25000 mirov Qibrîs û ji sala 1979'an heta iro gelê Kurd tê qirkirin."

Civîna çapemeniyê wiha hat domkirin: "Di dema hikûmeta Demîrel û Înönü de zêdeyî 20000 mirov hatin girtin, 385 mirov ji aliye kontrgerîla ve hatin kuştin, 300 gund wêrân bûn, 37 Kurd yên siyasi hatin kuştin û 7 bajêr hatin bombe-kirin.

Çawa bi afirandina têkoşîna rizgariya neteweya Kurdistanê di sala 1978'an de, bi şerê serxwebûn û azadiyê re di sala 1984'an û hwd. de metod û livbaziyê şoreşê li Kurdistanê ji hatine guhertin. Di dema paşeroyê de her dem rêxistinê klasik û feodal tênedigihiştin form, taktik û azînên xwe li gora realita Kurdistanê biguherin. Lewre jî ev rêxistin cihê xwe di rûpelê dîroka kevin-restî de girtine û êdî rista wan nemaye."

Greva birçibûnê bi atmosferike herî mezin ve di xaniyekî mezin de bi besdarbûna 700 mirov re bi moralekî mezin û şahî derbas dibe. Her roj bi se-

dan mirov ji hemû cihê Ewrûpa têr mîvaniyê. Komîta kar-ger li ser mîvaniyîn dibêje: "Nêzîkî 30000 mirov wê werin mîvaniyê. Telefon û faxa dairâ greva birçibûnê bê dawî kar dike. Ji her aliye cihanê name û mesaj tê. Her kes dibêje qiyamet rabûye. Greva birçibûnê bi rêxistinê pirr mezin û zanyar derbas dibe.

Neteweyeke bi xwedî rêxistin, tu car winda nake."

PIŞTGIRIYA GIRTÎ YÊN PKK'Ê

Girtî yêndaweya PKK'ê li Almanya Duesseldorfê ji bo piştgirî û destekkirina mebûsên Meclisa Neteweyî ya Kurdistanê, ji bo pênc rojan dest bi greva xwebirçîhiştinê kirin.

Girtî yêndaweya PKK'ê ku di zinda Duesseldorfê de ne, bi belavokê piştgiriya xwe dan xuyan ku dê di 1.2.1993'an de ji bo 5 rojan dest bi greva xwebirçîhiştinê bikin.

Girtî yêndaweya PKK'ê ya li Duesseldorfê di belavoka xwe de, zindanê dijmin ji xwe re mîna eniyeke berxwedanê dinrixin û ji bo xebat, alikarî û têkoşînê didin nîşan ku dûr qet ne girîng e.

JI GIRTİGEHÎN TIRKIYÊ PIŞTGIRÎ

Li girtîgehîn Tirkîye jî, girtîyên siyasi ji bo piştgiriya xwebirçîhiştina 15 mebûsên Meclisa Neteweyî dest bi greveke fi-reh kirin.

Li girtîgeha Mêrdinê 350, Diyarbekirê 850 Batmanê, 150, Mazrayê (Elezîz) 500, Ruha (Urfa) 39 girtîyên siyasi dest bi greva xwebirçîhiştinê kirin. Girtî bi navbeynkarîa ebûqatê xwe vê beyanê dan. "Ji bo protestokirina operasyonê ku bi navê tevgera hundîrin didomin û ji bo piştgiriya livbaziya 15 mebûsên Meclisa Neteweyî em dest bi greva xwebirçîhiştinê dikin."

LI BAZİDÊ LIVBAZIYÊN PIŞTGIRIYÊ

Li navcaya Mûşê, Bazidê jî, gel ji bo piştgiriya Mebûsên Meclisa Neteweyî û protestokirina operasyonê dewletê dest bi hin livbaziyan kirin. Li Bazidê, esnafan ji bo 2 rojan di-kanêñ xwe girtin û tu erebe ne-xebitîn. Li avahiya HEP (PKG)'ê jî, ji bo 4 rojan greveke xwebirçîhiştinê li dar ket. Ev livbazi di 26'ê meha Çileye de dest pê kirin. Li Kop (Bulanık)'ê jî, livbaziyan bi vî rengî li dar ketin.

GOTIN



Yaşar Kaya

Zivistan

Li Serhedê, di nav zimanê Kurdi de, gelek peyvîn bi Ûrisî (Rûsî) hene. Ji pençerê re dibêjin "akuşka", ji jînê o-rispî re dibêjin "matuşka", ji qe-dehê re dibêjin "istikan", ji tebexa çayê re dibêjin "tarilge". Serê we neêşînim, gelek gotin derbasî zimanê me bûne. Hemû ziman ji hev peyv digirin. Azerî jî gelek peyvîn bi Kurdi bi kar tînin.

Zivistan e. Niha li aliye Serhedê berf û bager kêm nabe. Çiya û banî niha ji berfê dagirtîne. Li çiyayê bilind bager heye. Rê girtîne. Rêwî riya xwe şaş dikin. Gelek çem qesem girtine û naherîkin. Zivistan li Serhedê zehf giran derbas dibe. Çiyayê Elegezê, çiyayê Tendûrekê, çiyayê Agiriyê, dest dane hev, heta deşta Rewanê dirêj dibin. Jixwe, li aliye din jî çiyayê Qafqasê hene. Deşta Rewanê di nav van çiyayan de maye. Belê dîsa jî zivistan gelek dijwar derbas dibe.

Di zarotiya me de jî wilo bû.

Carna alif kêm bû, giha û ka tune bû, pez û dewar birçî diman. Sala şerê paşîn û mezin tê bîra min (1945). Ez wî çaxî 6-7 salî bûm. Nanê genim tune bû. Xelkê nanê ceh dixwar, dû re jî nanê garis. Çay û şekir di wan salên şer de tune bûn. Bav û diya min berê bi kişmîşan çay vedixwarin, dû re jî bi sincyan. Me wê salê wisa derbas kir. Ji aliye İranê ve cerdî ser gundê me dikirin, çiqas pez û dewar hebûna bi şev dicivandin û di-birin wî aliye sînor.

Di wan zivistanê dirêj de, bi şev li malan, kal û pîrên me, çîrok digotin. Ew çîrok hê jî di bîra min de ne. Çîroka Enter, çîroka Siyabendê Silivî, çîroka Mem û Zînê, çîroka ker û golik, çîroka Memê Alan, mîna niha di guhê min de ne.


Gelekan, ji wan salan re digotin: "Sala şerê mezin, sala xelayê, sala birçibûnê". Baş tê bîra min, çem ziwa dibûn, li gundan av tune bû, ji bo çayê berf dihelandin. Hesp, çêlek, golik di tewlan de di-man, ji berfa zêde, carna pez der-nediketin derve, di axuran de di-man. Şivan û gavan, li gundan di-

man. Di zarotiya me de, li alî Ser-hedê zivistan wiha bûn.

Li welatê me, ger zivistan zehf sar be, berf gelek bibare, wê salê ji zivistanê re dibêjin "zivistana reş". Ji sermayê dest û pê nagirin. Zarok nikarin ji ber tendûrê rabin. Me gelek zivistanê wiha dîtin. Xort, di rojêni wiha de tajiyê xwe hildidin û diçin nêçîrê. Li çiya û baniyan digerin, hinek kîvroşkan digirin tînin, hinek jî rûvî dikujin û ji posten wan kurk çêdîkin. Carna li ber dîwaran, ji kewan tele (qefik) datînin. Çekirina tele zehf hêsan e, bi bendê çêdîkin, hinek jî ceh û genim li ser tele direşînin. Dema kew têne ku wê zadê bixwin, lingên wan di tele de dimîne, êdî nikarin derkevin. Me bi zarotî gelek kew digirtin. Hinek jî wan kewê gozel bûn. Kewa gozel cureyek ji kewan e, zehf xweşik e. Li Ser-hedê ji wan re dibêjin "kewa gozel". Di kilaman de jî gelek derbas dibin.

Di wan zivistanê dirêj de, bi şev li malan, kal û pîrên me, çîrok digotin. Ew çîrok hê jî di bîra min de ne. Çîroka Enter, çîroka Siyabendê Silivî, çîroka Mem û Zînê, çîroka ker û golik, çîroka Memê Alan, mîna niha di guhê min de ne.


Ew zivistan gelek zivistanê xweş bûn.



Osman Aytar girtin

Pesta li ser çapemeniya demokrat, sosyalist û welatparêz didome. Dewlet bi hemû hêzên xwe ve li hember çapemeniya azad, di şerekî diwar de ye. Hema tu hejmarên kovar û rojnameyan, ji berhevirine xelas nabin. Rojnameyan têne kuştin, rê li ber belavkirina rojnameyan tê girtin, xwedî û berpirsiyaren rojnameyan, di dadgehîn dewletê de, bi sedan salan têne cezakirin û pereyê ku ne mumkun e bidin, ceza dixwin.

Berpirsiyare giştî yê rojnameya Medya Güneşî Osman Aytar ji, ji ber niviseke xwe ya di hejmara dawîn de, ji ali Dodgeha Ewlekariya Dewletê (DGM) ve hate girtin. Berpirsiyariya Medya Güneşî, li ser girtina Osman Aytar, beyaneke çapemeniyê weşand û bêsebeb girtina Osman Aytar protesto kiran. Osman Aytar, ji ber nivisa xwe ya di bin sernavê "Di 1993' an de, ji bo hilpişkinen nû "hate girtin.



Tûrik li milê Demîrel

Rayedarên dewleta Tirk, ji nû ve tûrikên xwe avêtin ser milên xwe û iça li welatên Rojhilata Navîn derketin geşte.

Serokwezirê Tirkie Süleyman Demîrel, tevî heyetekî ve, li 5 welatên Rojhilata Navîn, dest bi gerekê kir. Li gor beyana Demîrel, dewlet ji vê geşte gelek bi hêvi ye û dê vê carê tûrik dagirin.

Di heyeta Demîrel de, gelek karsaz ji hene. Armana vê geşte, ji nû ve serûberkirina danûstandinêni bi welatên xelcî re ye. Piştî şerê xelcî, ambargoja ku danibûn ser Iraqê, zerareke mezin dabû Tirkîye. Ji wê rojê ve ji, têkiliyên abori yên di nav welatên xelcî û Tirkîye de sererast nebûbûn.

Tirkîye niha ji bo ji nû ve germkîna van têkiliyên abori, li 5 welatên xelcî digere. Demîrel û heyata xwe pêsi cüne Kuveytê. Dê ji wir ji, biçin Siûdi Erebistan, Behreyn, Qetar û Dewleta Emîriyê Yekbûyî.

Kontrgerîla nivîskarê rojnameya Cumhuriyet Uğur Mumcu kuş

Komploya mezin

Navenda Nûçeyan- Nivîskarê rojnameya Cumhuriyet Uğur Mumcu, di 24'ê Çileyê de li Enquerê hate kuştin. Mumcu piştî ji malê derket û li ereba xwe siwar bû, erebe bi bombezekê infilaq kir. Uğur Mumcu di cih de mir.

Li gor nûçeyen TV. û rojnameyan piştî bûyerê bi deh deqîqan "İslamî Kurtuluş Örgütü" (bi vî navî tevgerek li Tirkîye an jî li Rojhilata Navîn nîn e) û İBDA-C (tevgerek islamî) li suîqastê xwedî derketin.

UĞUR MUMCU Û CUMHURIYET

Uğur Mumcu, ji sala 1975'an ve di rojnameya Cumhuriyetê de di rûpelê pêsi de gotar dinivîsi. Berî Cumhuriyetê jî di yên, Türk Solu, Devrim de nivîskarı kiribû. Rojnameya Cumhuriyet bi alîkariya Mustafa Kemal (Atatürk) hatibû damezirandin û rojnameya Tirkîye ya herî kevn e. Dewleta Kemalîst ji her alî ve di parêze. Uğur Mumcu jî di nivîs û lêkolînên xwe de li ser mafya, Rabita "terorîzm" cemaetên islamî û tevgerên Kurdi disekinî.

XWEPÊŞANDANÊN (MITÎNGE) PROTESTOYÊ

Rojname û televizyonen Tirkîye, li ser kuştina Uğur

Mumcu geleki sekinîn. Li Stenbol, Enquerê û İzmîrê bi hezaran insan besdari mîtingen protestoyê bûn. Di meş û mîtingan de sloganen li diji islamî û dîndaran hatin avêtin: "Tirkîye laiq e wê laiq bimîne", "Tirkîye nabe İran", "Bimire Şeriat"... Bi van sloganan li Stenbolê êrisi buroya rojnameya "Tirkîye" û "Refah Partisi" kiran.


FÊDA KÊ JI KUŞTINA MUMCU HEYE?

Bi hinceta kuştina Uğur Mumcu dewlet, dixwaze zordariya xwe ya li ser muhalefetê dijwartir bike. Uğur Mumcu di saxiya xwe de bi kê re manazere kiribe çapemenî wî dike hedef. Ev hemû teqtik in û bi zanebûn dikan. Dixwazin hedefa esasi, qatil di nav vê keşmekêse de veşerin. Ne fêda Kurdan, ne ya musulmanan, fêda tu kesi ji bilî kemalîzmê (dewletê) pê ve ji kuştina Uğur Mumcu nîn e.

QATIL

KONTRGERÎLA YE

Qatilê Uğur Mumcu kontrgerîla ye. Ji bo vê idîayê ji sebep zaf in. Suîqast, geleki profesyonel e û piştî istîxbarateke xurt re bûye. Cihê mala Mumcu cihê navendî (merkezi) ye û bi 40 metreyî nêzîkî sefareta Tunusê ye. Di wê nuqtê de 24 saetan polis disekine.



Uğur Mumcu

Mumcu di germa havîne de ji êlekê pola li xwe dikir.

Berî buyerê çend rojan li Stenbolê dimîne. Lê xeynî emniyet û MÎT'ê pê ve, tu kes van istîxbaratan nikare bistîne.

Kemalîzm ev 3-4 sal in ketiye çepereke teng. Tevgera Kurd roj bi roj ges û gur dibe. "Refah Partisi" jî li metropolan rayê xwe zêde dike.

Dewlet, ji ber ku rê li ber muxalîfa bigire ev cînayet

tezgah kir.

Heta niha li Tirkîye çend rojnameyan hatin kuştin? Di salekê tenê de 12 rojnameyan hatin kuştin. Ka qatilê wan?

Televizyon û rojnama kampanya vekirin, ji ber ku herkes daxili cenazeyê Uğur Mumcu bibe.

Dixwazin bidin xuyakirin ku, herkes li dewletê xwedî derdi keve. Bi vî awayî "matabaqata neteweyî" bi pêş dixin.

HEP parêznameya xwe da mehkemê

Navenda Nûçeyan- Partiya Keda Gel (HEP), parêznameya xwe ya dawî, da mehkemeye bilind.


Mehkemeya Qanûnê Bingehîn, bi hinceta ku di herdu kongreyen 1991 û 1992'an de, propagandaya vejetinê (bölüçülük) hatiye kiran, ji bo girtina PKG (HEP)'ê dawe vekiribû. Mehkeme vê daweyê li gor madeya 125'an vekiribû. Dê mehkemeya bilind, bîryara xwe di nav meha Sibatê de bide.

Me li ser vê meseleyê, bi mebûsê PKG'ê yê Wanê Remzi Kartal re, bi telefonê axaftinek kir. Remzi Kartal vê daweyê weke bîryareke siyasi nirxand û wiha got:

"Girtina PKG'ê, ji tu kes û hêzî re fêde nayne. Jixwe li gor qanûnên niha, girtina PKG'ê jî ne mumkun e. Lê, dewlet li gor politikayê ku iro dimeşine, dikare bîryareke wiha jî bide. Lewre hêzên ku dewletê di bin kontrola xwe de digirin, gelek bir-

yarêni wiha, yê nedemokratik dane. Siyaseta ku iro li Tirkîye tê meşandin, ji bîryareke wiha re musait e."

Remzi Kartal pirsa me ya,



Remzi Kartal

Hevpeyînek bi dîrokzan û etnografa Kurd Lamara Farê Paşayêva re:

'Qewl û beytên Kurdên Yezîdî hewcveyê lêkolînan e'

R. Cizre: Xwişka Lamara ev e çend roj in, me li ser gelek pirsên siyasi, civakî û zanyarî xeber da. Armanca hatina me, ji bo we gelki zelal bûye. Berî her tiştî em dixwazin bi çûn û hatinê xwe bingehêke xurt, ji bo vegera we ya ber bi welat ve, ava bikin. Vê rojê ku, di Kurdistanê de, hemû kategoriyêن civakê tevlî şerê rizgariya netewaya Kurdistanê dibin, yekîtiya gelê me ava bûye. Li Kurdistanâ ku ji sedê salan ve, di bin nîrê dagirkeran de bû, iro jiyanek nû dest pê dike.

Doza em bi pêş ve dibin, doza rizgariya Kurdên Gurcîstanê ye ji. Lewma em dibêjin ku tiştîn hûn ji dikarin bikin gelek in. Nêzîkbûn û xurtkirina vî şerî barê we ye ji.

Xwişka Lamara, di warên siyasi de me baş hev naskiriye. Kar û barêne we, ji hisyâkîrîna gel li ber çavan e. Li vira em dixwazin bi we re xeber bidin. Hûn miroveke zanyar in di warê etnografiya Kurdan de. Di vê hevpeyîn de, em dixwazin bi giranî li ser hinek aliyen jiyana Kurdên Yezîdî rawestin. Ji ber ku di vî warî de, gelek tiştî hene ku pêwîsi in wekin zelalkirin. Di vê pirsê de, kêmâniyen dîroknaşen Kurd gelek in. Ev kêmâni ji weke hûn dibin bûne sedema ku niha hinek mirov dixwazin bi vê pirsê bazirganiye bikin û heta digihîn dereca gotina "Yezîdî ne Kurd in, ew mîletekî bi serê xwe ne."

Hûn cawa li vê pirsê dinêrin? Ev pirs ci tiştî datîne pêsiya zanyarîn Kurd? Rastiya pîrsa dîn çawa dikare were famkirin?

Lamara Farê Paşayêva: Di bin

wan pîrsan, van salêne dawî de, hinek mirovan xwestine berjewendiyênen xwe yên teng bi armanceke siyasi ya nê rast ve bi pêş bibin! Kê destûr daye wan li ser navê dîn milete me parve dike. Di nava her mîletekî de, dikare dînêne cuda-cuda hebin. Ji bo nimûne di nava Asûriyan de ji hene yakubî, hene nestoriyan û xiristiyanen mayîn. Ev pîrseke pîr normal e. Ev e 70 sal bûn me kesek nedidit. Heta di paseporten me de ji li cihê nîvîsa mîletiyê Yezîdî nîvîsine. Ev politika dewletê bû.

Helbet, gelek valahî hebûye ku wan mirovan karibûye hinek xerabiyê bikin. Lewma gelek tiştî li benda me zanyarîn Kurdan e. Gerek e em gelekî bigerin, arşîven herî kevn vekin. Qewl û beytên Kurdên Yezîdî hewcveyê lêkolîn û analîzkirinê ne. Mirov dikare gelek encaman ji wan derxe.

Di nava lêkolîn û nîvîsen zanyaran de, ku li ser anîna dînê Yezîdî amadekirine gelek cudahî û nakokî hene. Heta niha ji her yek bi aliyekî ve dîkişine. Di nava qewl û beytan bi xwe de ji nakokî hene. Dîsa gelek nîvîsen zanyaran li ser qewl û beytan li hev nakin. Lewma ez weke zanyareka etnograf pêwîsiyeke mezîn di dim şirovekirina qewl û beytên me.

Mixabin ku çavkaniyê nîvîsandî yên dînê me niha pîr û pîr kêm in. Bi baweriya min, hebûn, lê hatine windakirin û di dema êrisen dagirkeran de hatine şewitandin. Li vira destê me kin e. Ci hatiye nîvîsandîn me tev xwendîye. Lî dîsa ji têr nake.

Ancak enstituyeke taybeti pîr bixebite heta bikaribe van pîrsan zelal bike.

R.C.: Xwişka Lamara, werin em ji serî ve, dest bi pîrsan bikin. Pêşî çawa we ji got her zanyarek bingehêke hatina gotina Yezîd bi alyekî ve dîkişine. Gelo li gora we, ev gotin ji ku hatiye?

L.F.P.: Berî her tiştî ez dixwazim bibêjim ku, tu girêdanen gotina Yezîd bi Yezîdî kurê Muawiyê ve tune ye. Gotina Yezîd li gora gelek zanyarîn mezîn yên mina Mînorskî gotineke Îranî ye, ku tê wateya (maneya) Xwedê. Ji vê gotinê ji navê me hatiye. Yezîdî yanî yên Xwedê dihebinin û bi hebûna wî bawer dikin.

R.C.: Xwişka Lamara ez li hinek qewl û beytên Yezîdiyan dinêrim, para bêhtir gotinê Erebî ne. Xuya dibe ev qewl û beyt piştî derketina İslâmî û piştî vegirtina Kurdistanê ji hêla dagirkeren Ereb ve, hatine cêkirin. Ji navêne ku di wan de derbas dibin û pirrbûna gotinê Erebî ev tiştî gelekî bi zelalî derdikeve holê. Hûn vê yekê çawa dibinîn? Dinê Yezîdî berî İslâmî bi dîtinâ we çawa bû?

L.F.P.: Gotina Yezîd di sed sala 11'an de, derketiye holê. Heta berî wê demê Yezîdî weke ku, Şerefxanê Bedlîsi dibêje, tenê bi navê "Dasinî"yan dihatin naskirin. Xuyaye ku berî İslâmî ji, dinê Yezîdî hebûye, lê hema pîr zelal nîn e. Heta niha ji di nava Yezîdiyan de, qebîleke mezîn û qedirgirtî bi navê qebîla Dasinîyan heye. Li Tibilîsê ji zehf Yezîdiyan Dasinî hene.

Bazîl Nîkitin dibêje: "Heta em zargotina Yezîdiyan baş hîn

Dr. LAMARA FARÊ

PAŞAYÊVA: Roja Mijdara sala 1940'ı li Gurcîstanê, bajarê Tibilîsê hatiye dinê. Malbata Lamarayê, ev e 70 sal in li Gurcîstanê bi cih û war bûye. Lamara, xwendîna xwe ya bilind bi zimanê Rûsi qedandîye. Di Enstituya Rojhîlatzaniyê e, para etnografiyê de, desartasiyona xwe ya doktoriyê li ser Hurumê Gurcîstanê pêşkêş kiriye.



Gelek xebatên zanyarî yên Lamara li ser pîrsen dîrokê û etnografiya Kurdan û Asûriyan derketine. Niha Lamara li ser etnografiya Kurdên Yezîdî lêkolîneke zanyarî ya dirêj amade dike.

Ev hevpeyîn bi Dr. Paşayêva re, roja 4.1.1991'an, li bajarê Tibilîsê hatiye cêkirin. Ji ber girîngîya pîrsen ku di vê hevpeyîn de hatine gotin, her çendî ku bi derengî ji be, em bi temamî bêguhertin û bêkinkirin diweşînin.

R.C.: Hûn dikarin ji me re hinekî li ser girêdanen dinê Yezîdî yê iroyîn bi dinê Zerdeşti (zoruhus-trizmî) ve, rawestin?

L.F.P.: Gelek xebatên zanyarî hene ku dibêjin: Dinê Yezîdî dinê Kurdan yê kevn bûye. Paşê bûne Zerdeşti û dû re bi destê zorê di dawiya sed sala 7'an û destpêka sed sala 8'an de, bûne musulman. Yezîdiyên iro ji ew mirov in ku dinê İslâmî qebûl nekirine.

Elementên Zerdeştiyê di nava dinê Yezîdî yê iroyîn de pîr in. Lî belê elementên astrolojiyê û dinê Asûriyan yê kevn ji hene. Lî vê paşwextiyê gelek tiştîn İslâmî ji têde hene. Her wiha elementên dinê İsa û Mûsa ji hene, lê para bêhtir elementên Zerdeştiyê ne.

Wê bidome





Bi singûyan her tişt tê kirin, lê li serê nayê rûniştin.

Napoléon

Seydwani

Şima heme rind zanê, ê ki zaf zûrî kenê, pêlek do bol ra erzenê, jewî kenê des û zûranê xwi weş ümîş kenê ú anê pê ro seydwaniyê.

Mêrdim zûrandê seydwanan ra mird nêbeno ú huwate re teqeno. Kes wazeno herwext i-nan heti roşo ú goştarey a qisan û zûrandê ïnan bikero.

Wexto ki zûrî kenê, erzenê, zûranê xwi ümîş kenê ú hedef di (nişan di) danê piro. Zûranê xwi wini xembilnenê, wini xembilnenê kenê zey keynek a veyvî biyayê ú azmîn ra pernenê.

Nê zûrê ku ez do şima rê, mi bi goşandê xo ya, wêrandê zûriyan ra goştarey kerdê. Ê cemeati di ronişa wêranê è zûran weş sinasnena ú ez i biya tewdê è zûran.

Nê zûrê ki ez do şima rê binûşna, ê dewandê mintîqa da Adina (Adana) yê.

Ne dawa ki nê zûrî tey biyê, ronişwanê a dawi se ra heştay (%80) Kurdî bî.

Wexte xo di qandê dişmeney yan jî hukimatî dest remayê ú ameyê Adina.

Ez bi xwi jî, pancês seri Adina di menda. Mi wija di (Dewlet Su İşleri di) teknike-rey kerdê. Qandê coy hergi roj, ez şiyê nê dewan ser ra gey-rayê. Dayen û girotena mi dewijan û citêran a zaf estî bî.

Rojê ma qahwexane de dewda Yenikoy di ronişti bî. Ma pawîti ki çeya tezê bivîjiyo ma bişimê ú şirê. Labrê şofere mi nêwaşte ma şirê. Qandî ki a rojî heme seydwani a dawi di,



o qahwexane di kom bibî. Solixna do mesela weş kerdê, Şofêr ê mi va ki: Ma nêşinê hebê na qahwexanê di vinderê ú goştareya qise ú zurandê nê seydwanan bikerê?

Solixna nînan dest pey kerd. Jewî degortî, jewî teqnê. Jewî hewna ê xo nêqedinê bî è bînî ci fek ra girotê ú domnayê.

Ma işkemeyê xo girotî ú ma şimi nînan kişt ra ronişti mi.

Seydwanan bi kef a bi heycan a, bi huwateya dest bi meselândê xo yê seydî kerd.

Wexto ki ne-xwi tewnayê ú ne jî çorşmey xo tewnayê.

Jû, jû fini jî miyabeyn di "zirt" mîrt vatê ú vengê do zaf berz a teqnayê ú huwayê. Jû jû fini jî jew jewî vatê: Hebê bê war, hebê bê war nika cor di sî do, kemerî do bîrê ma sere ro. Nika ma bîrê zûran ser.

Jewî dest bi mesela da xo yê seydî kerd ú wina va: Enbazêno, hefteyo verên roj a di-

şemê şefaqê rew ez werîsta. Mi rextê xo girêda, çizmeyê xo kerdî xo pay tifinga xwi eşti xwi qol, tewreyê xwi eşt xo mil ú verê xwi da dewda Ciriqî.

Ver a dewî hêdî hêdî mi ray girotî ú ez şiya. Ameya nezdî dewda Ciriqî, mi hen di, mi vernî di mergî mîyan ra refedê (qefleyê) werdegan werîst. Mi hima tifinga xwi xo qol ra ronê, kerdi raşt, verê ci kerd hetê werdegan a ú tetigê ci ant.

Wexto ki gumînî kewti tifing da mi ser, tewrdê gumînî da a ya wîrî-wîrî, çilo wîlo yê jî kewt a werdegan ser. A gumînî ú çilo-wîloy mîyan di refê werdegan têtewr ame war ú hergi jû kiştêna pirpizîye.

Ez remaya şiya jû bi jû mi êrd a sereyê ci cikerd ú eşti pê ser.

Heme cikerdî ú arêkerdî pê ser tepey a, ez wînyaya ki ci bewnîya. Hergi saçme ri çîhar-panç werdegi qul kerdê ú ci ra ravêda şiya. Me werdege xo a-mordî, tam şestî heb bî. Ni-meyê werdegan saçman a, ni-meyê ci jî veng ú gumînî di tifingda min a kewti bî. Gumînî ú vengdê tifingeri ra zahrê ci, ci pîze di teqayo ú kewtê.

Bizanê, bîmisê, dostêno bîmisê tifingi senî erzêna (çebêna), Nişan pa senî gérêno ú pa seyd senî beno, bêrê mi ra bîmisê.

Îştê ez no ya, ez seydwânê do winaya. No welat di mi ser ra seydwân çinîyo. Qerşûn hu saçmeyê mi veng nêşinê. Veng şirê jî gumînî ú vengdê ci ra kewnê. Veng tifingda mi tenîya besê seydêmîn o.

Xort û kal

Xort dibêje, "Na ez ne Kurd im, ez Türk im." Kal dibêje, "Lawo em hemû Kurd in." Na dibêje xort. Kal dibêje, "Lawo ez dê, bav, kal û pîren te rind nas dikim tu Kurd i." Xort bi hêrs dibêje, "Na, ez ne Kurd im". Kal, desten xwe vedike, stûyê xwe dikişine dibêje, "Tu rast dibêji, wextekî cendirme ú tehsîldar ji mala we kêm nedibûn."

Du heval û hirç

Du heval diçine daristanê. Hirçek derdikeve ser riya wan. Yek ji wan, ji tırsan direve derdikeve serê çinarekî. Ê din ê belengaz, nizane ci bike. Hema ji tırsan mîna miriya xwe li ber hirçê davêye erdê. Hirç dere, diçê, tê, patika stûyê wî bîn dike, rê dikeve diçê. Ew ê serê darê peya dibe, tê ji hevalê xwe dipirse: "Kuro hirçê ji te re ci got?" Dibêje, "Hirçê ji min re got, "Kurê kerê tu çîma bi kesenî tîrsonek re hevaltiyê dikî."

Faik Timur

TİR

Musa Anter



Însanê Türk

Berê li Tirkîyê digotin însanên Tirkîyê ne digotin ên Tirk. Yanî em Kurd, Laz, Boşnaq û Arnawût em hemû însanên Tirkîyê bûn. Lî niha ez dinêrim mîrika dev ji wî hawî berdan e, dibêñ însanên Tirk.

Ji layê din ve jî, dibêñ li Tirkîyê 20 milyon Kurd hene, çar milyon Boşnaq hene û Ereb Arnawût û Laz jî. Ew vê dibêjin. Erê ma ev ne ji hevveqetandine, yanî bi Tirkî ne "bölcülük" e ma ci ye? Hikûmet dibêje me gelek tişt birin ji însanên Tirk re; me ji însanên Tirk re xizmet bir û me xizmet kir. Rast, derew li aliyeke de ka îca bê ci birine ji însanên Kurd re? Ew dikin lê nabêjin. De ka ezê bêjim: Mirin, surgun, işkence, bi hezaran xorten seqet û yên windayî, feqîrtî, bêşixultî, di zîndanan de hêşirtî û înkara huviyeta wan. Ku Kurd li ber vê radibin navê me dibe eşqiya û terorist. Ê ku em bi serê çiyan dikevin û yên din jî, ji welatê xwe direvin. Îşte di vê pirsa zilamên me yê dewletê de, li gora aqilê xwe ev tiştê ku ji Kurdan re dikin di dilê wan de ku, ji însanên Tirk re xizmetê

dikin. Nizanîn ku bi destê xwe mala însanên Tirk xera dikin. Ma lawo em di dewra împaratoriya Roman de ne ku însanên Tirk hurr û efendî ne û yên ne Tirk kole bin. Ma we mesala Spartakus jî nexwendiye? Wextek tê ku koletî hew tê tehêmûl kirin radibin ser xwe û bavê efendiyan dişewitînin. Di tarîxa koletiya dinyayê de yê ku pêşî serhîdan kiriye û miwafaq bûye di bin idâra Kawa de Kurd in ku Dehaq û însanên Dehaq di saetekê de perçiqandine.

Em dinêrin zilamên me yên idarê nizanîn bê dibêñ ci, ma ci idare û ci hal? Tu li civîneke wezîren me binêrî mirov dibê qey muxtar li hev bûne kom. Sê behir (par) ji milet em navêñ wan nas nakin. Ma emê ji ku erzîhalciyê Tirkîyê hema nas bikin. Her sal nifşek ji wan dibe wezîr. Wê rojê yekî ji min re got wezîrtiya wan ne ji bo ku işekî bikin, hevdu dikin wezîr, ku sibe meaşê teqawîdiya bakanan bistînîn. Ma yana wezîrtî wîlo ye? Gerek wezîr yanî nazir yanî wezîr bi aqil be, bi edeb be û însan be. De binê wê rojê wezîre me yê Bursayê herî nêzîkî Süleyman Demîrel, Mustafa Çağlar got ci: "Bila Ermenî me neqeherînin, emê di dê û xwehîn wan ...in. Ê ma ev bû? Ji leyê din de jî 20 milyon deynê xwe yê vergiyê kir ber efûyê. Ma ev feqîrên Tirkîyê em jî Ermenî ne ku tu deynê xwe nadî, tu heqê feqîr û fiqaran didizi.

Ma ez nizanîm ezê bêm ci. Hema tu wan tev bidî, bêhîn ji wan tê. Ëdî ez ditirsim işna bînîn serê min, bê cîma tu min tev didî.

Koyo Berz

Kontrgerîla li her derê...

Navenda Nûçeyan- Hizb-î kontra, her ku dikeve tengasiyê û derbeyan dixwe, bê ser û çav û bê hedef mirovan dikujê. Li herêmên ku livbaziyên vê hêzê didomin gerek mirov bê sebep hatine kuştin. Di nav gel de ji, psîkolojiyeke tîrse xwe diyar dike. Jixwe aramanc ji ev e. Li gelek welatên ku têkoşina rizgariyê lê hatiye dayin, rîxistinê bi vî rengî li hember hêzên azadîxwaz derketine. Ev hêz li dînyayê bi navê Gladîo (Kontrgerîla) tê nasin. Hêzeke navneteweyî ye. Navenda wê NATO ye û li gelek welatan, di bin navê cure cu-re de, rîxistinê pê ve girêdayî he-ne. Ev hêz li Kurdistanê, ji bi navê Hîzbüllah xwe dide nasin. Ev hêz li hemû welatan, li gor menfeetên dewletê û li dijî hêzên muxalif livbaziyan pêk tîne.

Cînayet, qetliam û talan karên vê hêzê ne. Li Vietnamê, Arjan-tinê, El Salvadorê, Şiliyê, Guate-malayê, Kamboçayê û li bi dehan welatên din, bi sedhezar mirov ji alî van hêzan ve hatine kuştin. Tenê li Vietnamê 30.000 mirov li derveyî şer, ji alî vê hêzê ve hatine kuştin.

Divê Kurd ji, bi vê zanînê têkoşina xwe li hember vê hêzê xurt bikin. Têkoşina li hember vê hêzê, bi têkoşina rizgariyê ve girêdayî ye. Lewre dijmîn yek in.

Gerîla bersiva kontrayan dide

Gerîlayen ARGK'ê, dest bi êrişen ser kontrayan kîrin. Li Di-yarbekir, Farqîn û Batmanê, bi êrişen gerîla nêzîkî 30 endamên hizb-î kontra hatin kuştin. Èris, ji bo tunekirina vê hêza kontrgerîla pêk tîn.

LI DIYARBEKIR 15 HIZB-Î KONTRA HATIN KUŞTIN

Li navenda Diyarbekir, li 2 qehwexaneyen hizb-î kontrayan, bi bombe û çekan êrişek pêk hat. Li nêzî van qehwexaneyen maleke hizb-î kontrayan ji bi bombeyekê hate rûxandin. Li qehwexaneyen 11 kes ji endamên hizb-î kontra



Gerîla derbeyen xedâr li kontra dixe.

hatin kuştin, 11 kes ji birîndar bûn. Li mala ku bombe tê de te-qiya ji 4 kes hatin kuştin. Gerîla pakêtekê didin destê kurê xwediyê malê û jê re dibêjin ku bide bavê xwe û ji bili wî, bila tu kes veneke. Zarok ji bombeyê dibe malê. Endamên hizb-î kontra li vê malê di civînê de ne. Pişti bombe vedibe, diteqe û 4 kes ji kontrayan dimirin.

BATMAN DIKELİJE

Li Batmanê ji, ji êvara ina çuyî û bi vir ve, gerîla li hember hizb-î kontrayan dest bi kuştanın kîrin. Èrişä yekemîn, li taxa Baxlar bi êrişä ser maleke kontrayan dest pê kir. Ev mal bi çekên gîran hatin gullebarankirin. Di vê malê de Metîn Turan (25) mir. Pişti vê bûyerê bi demeke kin li eynî taxê li malekê û li dikaneke beqaliyê ku di bin de ye, bi bombe û roke-tavêjan êrişek pêk hat. Di vê êrişê

de Abdurahîm Yıldız û Murat Yıldız mirin. Di eynî saetê de, bi roketavêjan êrişek li ser mala Gürsel Parça pêk hat. Di vê êrişê de, Gürsel Parça bi xedâr birîndar bû. Li gor agahiyan, mileki wî ji bedena wî veqetiyaye.

Êvara şemiyê li taxa Şaxlıqê Yaçın Erdînç hate kuştin. Li taxa Aydinlik'ê ji Yaçın Gözetür, bi êriş-ke wiha hate kuştin.

Roja sêsemî ji, 2 kes di erebe-yekê de, hatin gullebarankirin. Di vê êrişê de Hadî Yıldız û Behçet Kılıç birîndar bûn.

LI FARQÎNÊ ÈRÎŞEN GERÎLA

Li Farqînê ji, ev demek e li hember hizb-î kontrayan êrişen gerîlayen ARGK'ê didomin. Li Taxa Mecîtê de kuçeya Demirciler de, gerîla li ser riya endamekî hizb-î kontra kemîn danin. Di vê kemîn de, M. Veysi Baran bi gu-

lebarana gerîlayan hate kuştin. Dîsa eynî li wê kuşeyê, ber bi nîvre ve, endamekî din yê hizb-î kontra ji hate kuştin. Ev hizb-î kontra bi navê xwe Ahmet Okuyucu, bi gullebarana gerîla, li cihê bûyerê mir.

HIZB-Î KONTRA BÊ SER Ü ÇAV ÈRÎŞ DIKE

Li Batmanê, bi êrişen gerîla re, hizb-î kontra ji, bê ser û çav û bê hedef êris pêk anîn. Roja êvara şemiyê, li taxa İpragazê welat-parêzek bi navê Selîm Yeşilmen le-qayê çend kesen endamên hizb-î kontra dibe û di nav wan de şer derdikeve. Di vî şerî de, Selîm Yeşilmen tê kuştin. Roja yeksemî ji, Orhan Arik û Vafettin Gökbülut, bi êrişke hizb-î kontrayan hatin kuştin. Ev herdu kes ji, bi welat-parêziya xwe dihatin nasin.

Li Farqînê ji, li taxa Mecîtê, Sellahadin Karakan bi êrişä kon-

trayan hate kuştin.

Dîsa li Batmanê hizb-î kontra bi êrişekê Ayhan Üzüm birîndar kîrin.

Li dû van êrişan, 2 bira û kura-peki wan, bi êrişä kontrayan hatin kuştin. Li taxa Baxlar Metîn Ak-yildiz, Hüseyîn Akyildiz ji bi xedâr birîndar bûn. Ji ber ku ev kesen hatin kuştin, bi tu hêzî re, di têkiliyeke germ de nîn bûn, di serê bûyerê de, kîfî nebû ku kijan hêz vê êrişê pêk anîye. Dû re diyar bû ku ev kes bûne qurbana êrişen hizb-î kontra yên bê hedef.

LI GUNDÊN ÇINARÊ TERORA HIZB-Î KONTRAYAN

Hizb-î kontra, li gundan ji teroreke bi qirêj dimeşine. Li gundan girêdayiyê Çinara Diyarbekir, 2 kes ji alî vê hêzê ve hatin kuştin.

Bûyer, pêşî li gundê Çinarê pêk hat. Komeke hizb-î kontra, bi ser mala Timûr Seçîci ve digirin. Timûr Seçîci bi gullebarana kontrayan, li cihê bûyerê dimire. Gundiyen Çinarê, beyan kîrin ku Timûr Seçîci, ji alî endamên hizb-î kontra ve hatiye kuştin.

Di eynî êvarê de, endamên hizb-î kontra, li gundê Dalavgurê êrişekî dîbin ser mala Habip Dağtekîn. Di vê êrişê de, Habip Dağtekîn tê kuştin. Li gor beyana pî-reka Habip Dağtekîn, ev êris ji alî hizb-î kontrayan ve pêk hatiye.

Pîreka Habip Edûlê navê 2 kesen êrişkar ji dide. Li gor Edûlê qatîlin Habip, Mustafa Akbaş û Mehmet Yağız in. Li van gundan gundi van agahiyan dan: "Ji salakê ve ye, li herêma me cînayet pêk tîn. Ên ku van cînayetan dîkin bi tevî serokên xwe ve têne nasin. Lî der heqê wan de tu tişt nayê kîrin. Ê ku van idare dike û xelkê bi wan dide kuştin, meleyê gundê Gurco, Mele Ubeyd e. Bi mirovîn li der dora xwe, ci dixwaze dike. Qereqol ji li wan temaş dîkin."

Li Çukurovayê ARGK livbaziyên xwe sift kir

Navenda Nûçeyan- Di navê hefteyê de li Edenê û li nav-çeyen wê 10 leşker, 2 ajan hatin kuştin û çar kes ji hatin bi-rîndarkirin. Gerîlayek ji pişti ku bi birîndarî tê girtin, ji alî leşkeran ve tê infazkirin.

Di şerê navbera gerîla ku 80 kes bûne û hêzên dewletê de 10 leşker û gerîlayek hate kuştin.

Di rojê 22-23.01.1993' an de li taxa Gulbahçesi ya Edenê M. Şakir Yavuz, li taxa Torosê ya Edenê, Mehmet Çimîn û li taxa 19 Mayıs ji

ran hatine bikaranîn. Di vî şerî de gerîla Halîl Karadenîz ku ji Suruca Ruhayê ye pişti bi saxitî tê girtin, ji alî leşkeran ve tê infazkirin.

Hezîn dewletê di vî şerî de geleb birîndar ji didin. Di da-wiya şer de 5 karkerên komerê ji ber ku alîkîya gerîlayan kîrine, hatine girtin.

Di rojê 22-23.01.1993' an de li taxa Gulbahçesi ya Edenê M. Şakir Yavuz, li taxa

Mehmet Gensor hatin kuştin.

Komîserek ji qereqola Hurriyetê di encama livbaziyeke bombeyê de hate birîndarkirin.

Li Edenê li texma (tanga) Yanîbey-Akkapi, erebeşa polîsan ku derketibû dewriyê hate gullebarankirin. Sê polîs birîndar bûn.

Di dawîya van livbaziyan de Eyaleta Çukurova ya PKK'ê daxuyanî kir ku, hemû livbaziyan ew kirine.

Li gor daxuyaniya Eyaleta Çukurova ya PKK'ê Mehmet

Şakir Yavuz ji ber hevkariya xwe ya bi dewletê, Mehmet Çimîn ku ji navçeya Hîlvana Ruhayê ye û 8 sal ji doza PKK'ê raketibû bi hinceta iti-rakarya xwe li Mêrsinê, Mehmet Gensor (Ruha-Suruc) ji bi hinceta ku navê PKK'ê bi niyeteke xerab bikaraniye, ji alî gerîlayen bajêr ên ARGK'ê ve hatin kuştin.

Li aliye din Komîteya Eyaleta Çukurova ya PKK'ê kurê Serekê Çeteyen Gundân Mêrdinê Kaynakkaya Abdulve-

hap Önen ku 32 çete li ber destê wî ne, hate berdan. Mehmet Önen (16) di 05.1.1993'an de bi mîvandarî hatibû Edenê cem lêzimên xwe. Li gor daxuyaniya komîtê, li ser lavekirina diya wî Mehmet Önen berdane.

Dîsa di 24.01.1993'an de li taxa Dağlioğlu ya Edenê pişti cerda polîs û tîman a ser du malan Sinan Güneş û Haci Re-sul ku paşnavê wî nehate hînbûn, ji alî polîs û tîman ve bêsebeb nîşandan hatin girtin.

Qetliamên cerdevan didome

Navenda Nûçeyan- Cerdevan qetliamên û talanên xwe didominin. Qetliamên wan ên li ser gundiyan siwil û bêcek di sala 1993'yan de ji dom dike. Ev kirinên wan li ber çavên hêzên ewlekariyê yên dewletê pêk têw û ew ji, ji van re bêdeng dimînin. Mebûsen ku dixwazin li ser vê pirsgirêk bisekinin û herin bûyêran li herêmên wan binirxin jî, ji alyî cerdevan ve têw tehdîtkirin. Di 1993'yan de nêzîkî 20 insan ji alyî cerdevan ve hatin kuştin.

Di 24'ê Çileya 1993'yan de gerilayen ARGK'ê saet di heşt û nîvan

de bombe avêtin Kiraatxaneya Aslan a ku li Midyadê ye û di destê cerdevan de ye. Di vê bûyerê de 3 kes ji cerdevan birîndar bûn. Dû re Serokê Cerdevan Felemez Aslan (Felemez Cumo), Hasan Acar (Hesenê Şehrê), Serhoş Kemal û Abdülâh Taş (Havînê) û zilamên xwe zordesiya xwe ya li ser gundiyan zêdetir kirin. Cerdevan li Midyadê, Taxa Cumhuriyetê, avêtin ser mala Salih Tekin û nasnameya wî kontrol kîrin. Pişti vê kontrolê ew revandin û birin. Di navê de nîv saet derbas na-be ica davêjin ser mala pismamê Sa-

lîh Tekin, Ömer Tekin ku ji SHP'ê Endamê Meclisa Belediya Midyadê ye. Di mala wî de lê işkence dikin. Di vê cerda cerdevan de jina Ömer Tekin, Hayat Tekin serpêhatiya xwe wiha tîne zîmîn: "Pişti ku li nasnameyên me pirsin me fêm kir ku cerdevan in. Gazî mîrê min kirin gotin, "Were li derive îşê me bi te heye", mîrê min neçû derive û li ber çavê min û zarakan işkenceyê lê kîrin. Li ser qîre qîra me cîranên me hatin hewara me. Lî cerdevan ew ji bi mirinê tehdît kîrin. Bi vî awayî mîrê min ji mirinê filiti lê li zaroka me ya 3 salî ji işkence kîrin."

Li ser van kirinên cerdevan Serokê Belediya Midyadê Isa Ekingen wiha axivî: "Nêzîkî 20 insanên me ji alyî van cerdevan ve hatin kuştin. Gerîla li wan dide, ew ji berê xwe didin xelkê. Ü roj bi roj ji gundan berê xwe didin navendê bajaran weke Midyadê. Cihê wan gund in, bila li wir bimîn."

Di eyni rojê de cerdevan avêtin ser gundekî Batmanê yê bi navê Esê û zorî li gundiyan kirin ku gund vala bikin.

Nahêlin şoférên minibusan têkevin Midyadê. Şofér li ser vî awayî wiha dibêjin: "Nahêlin em herin Midyadê. Em nizanîn wê ci bikin ji me. Em newêrin ji rojnameyan re ji behsa xwe bikin. Me bi kuştinê tehdît dikin. Li virê dewlet nîn e."

CERDEVAN MEBÜSAN JÎ TEHDÎT KIRIN

Li ser van bûyeran û rewşa hin gundiyan ku bêdilê xwe vê wezifeyê dikin, mebûsen HEP'ê Mehmet Sincar, Ali Yiğit Serokê Navendê Mehdi Aslan, Serokê Qoser (Kızıltepe) Şehdavur Yalçinkaya û tevî rojnameyanan xwestin bi serdanekê herin ba Waliyê Mîrdinê Yahya Gür. Di 23.01.1993'yan de ev heyet çû ku here Mîrdinê lê riya wan ji alî hin kesen bi cilê sivil ve hat birrîn û xwestin ku nasnameyan kontrol bikin. Rojnameyanan ji, ji bo resman nekişinin tehdît kîrin.

Di 24'ê Çileya 1993'yan de gerilayen ARGK'ê saet di heşt û nîvan



KURDISTAN

xwe ev in: Reşo (Ferhat Uzun), Numan (Cemal Özalp), Dr. Kemal, Hogir û Rewşen.

Ev her sê navce ji bi temamî besdarî vê livbaziye bûn û hem kirinên dewletê yê bi navê "tevgera hundirîn" û hem ji kuştina her pênc gerilayen ARGK'ê protesto kîrin.

ASURÎ LI STOCKHOLMÊ XWEPEŞANDANEKÊ

Gelê Asurî li Stockholmê xwepeşandanekê li dijî kirinê Tirkîye çêkir. Xwepeşandan bi besdarbûna 2 hezar mirovî di 23.01.1993'yan de pêk hat.

Xwepeşandan bi amadekirina Federasyona Komeleyen Asurî û bi besdarbûna gelê Asurî, Kurd, Ermenî, û Swêdî li ber darê konsolosxaneya Tirk a li Stockholmê qedîya. Sê parlementerên Swedî ji besdarî ve xwepeşandanê bûn. Xwepeşandan, ji bo protestokirina heft gundiyan Asurî ku li gundê Midyadê Çayırîli hatibûn kuştin, çêbû.

Di vê xwepeşandanê de gelek dîrûşme (slogan) li dijî Komara Tirk (TC) hatin avêtin. Weki, "Gel hemû bira ne, Bimire Komara Tirk a faşist, Bimire Kontrgerîla" û hwd.

Xwepeşandan li ber derê konsolosxaneya Tirk rawestiya, çelengeke reş danîn ber derî û agir pêxistin. Xwestin nameyek ji bidin konsolosxaneyê lê name nehate standin.

Serokê Federasyona Komeleyen Asurî û Parlementerê Swedî Berît Erikson axîfîn. Herdû ji li ser qetliaman rawestiyan û dan xuyan ku bi van qetliaman dewleta Tirk tu tiştek bi ser naxe. Weki din ji li ser politikayen dewleta Tirk ên nîjadperest ji hate sekinandin.

Li sê navçeyan kuştina gerîlayan hat protestokirin

Navçeyen Amedê Pasûr (Qulp), Bismil û navçeya Mîrdinê Dêrik, ji bo rojekê dikanê xwe venekirin. Esnafê her sê navçeyan ji bo şingirtina her pênc gerîlayen ARGK'ê û ji bo protestokirina kirinên dewletê yên li Kurdistanê kepengê dikanê xwe venekirin.

Esnafê her sê navçeyan, li ser her pênc gerîlayen ku li gundê Uzunkaya yê Qoserê (Kızıltepe) di 20.1.1993'an de bi serê hêzên dewletê re şehîd ketibûn û li ser "tevgera hundirîn" a dewletê ku gundan bombe kiribûn, şewitandibûn, vala kiribûn û gelek mirovî sivil kuştibûn vê livbaziye pêk anîn.

Gerîlayen ku hatine kuştin ji Eyaleta GAP'ê ne û mirovîn gelek girîng in. Kesên ku hatine kuştin tevî nav û bernavkên xwe ev in: Reşo (Ferhat Uzun), Nûman (Celal Özalp), Dr. Kemal, Hogir û Rewşen.

Ev her sê navce ji bi temamî besdarî vê livbaziye bûn û hem kirinên dewletê yê bi navê "tevgera hundirîn" û hem ji kuştina her pênc gerîlayen ARGK'ê protesto kîrin.

Weke tê zanîn dewlet bi "tevgera hundirîn" bi taybetî li navçeyen Hezro û Pasûrê gelek xesar dabûn gundiyan. Gundan şewitandibûn, vala kiribûn û gelek kesen êrî û bêrî hem girtibûn û hem ji kuştibûn.

Gel meşîya

Di 25 Çile 1993'an de, li Diyarbekirê li texma Çiftkapiyê grubek xort ku bi giştî xwendevanenê Üniversiteyê bûn, ji bo portestokirina qetliamên ku hêzên dewletê li Pasûr, Piran, Licê û Hezroyê kiribûn û di van qetliaman de zarokekî du salî û 5 gundî hatibûn kuştin meşekê çekirin. Grûba meşvanan bi dîrûşmeyen (slogan) "Bijî Kurdistan", "Bijî APO", "Bimire Kontrgerîla", "Bijî Kurdistan", "Bijî Meclisa me ya Neteweyî" avêtin û erebeyeke polisan ji bi molotofan şewitandin. Polisan pişti vê bûyerê ji cihê bûyerê gelek kes birin û xistin bin cav.

Li Cûlemêrgê aşît

Di van rojê dawî de, li Cûlemêrg (Hekarî) û navçeyen wê, aşît can distîne. Heta niha 56 gund, ji ber talûkeya aşîtê hatin valakirin. Xelkê li van gund û mezrayan, heta dawiya zivastanê li cem lêzimên xwe yên li bajar û navçeyan bi cih bûne.

Di bûyerâ dawî de, di nav Cûlemêrgê û Çelê (Çukurca) de, aşît bi ser mînibusekê ve herikî û 3 kes di bin aşîtê de mirin. 2 kes ji birîndar bûn.

Li gundekî Cûlemêrgê ji, mînibuseke din, di bin aşîtê de birin. Di nave de mîv sacî derbas na-be ica davêjin ser mala pismamê Sa-

mîrê min ji mirinê filiti lê me ya 3 salî ji işkence kîrin.

Li ser van kirinên cerde-

rokê Belediya Midyadê Isa wiha axivî: "Nêzîkî 20 insa-

yen şînîkî, di 10.1.1993'an de diqewim-

mehî didome.

Li gor çavkaniyê

kuştı û birîndar hene leşkerek û serbazek b-

ne Nexweşaneya C-

letê.

Hêzên dewletê b-

sê roj li ser hev ji bo devanîyê (cetetiyê

pêkutiyê li gundiyan

LI HEZEXÊ G HATIN GI

Li Hezexê, navç-

erasyonê hêzên

kes hatin girtin. Di

25.1.1993'an, de sa-

bêhê de 150 kes hat-

ku hatine girtin bi

Di van cerdeyên se-

rokê Navçeyê yê HE

PÊNÛS



Amed Tigris

Welatparêzî û dilxwazî

Naveroka gotina welatparêziyê gelek fireh e. Ev gotin, ji bo ew kesên militan ên ku canê xwe yê şirîn ji bo welat û gelê xwe feda dikan, heta ew kesên ku bi xizmet, kar û berhemêr xwe yên büyük ve besdarê têkoşînê dibin re, tê gotin. Yanî pîvana welatparêziyê xebat e. Federkarî ye. Lî, hezar mixabin carnar em, ji hinek kesan re dibêjin "filan kes welatparêz e." Heta em dibêjin ku "ew welatparêzek baş e." Ez bi dehan an ji bi sedan kesên wiha ku ji wan re dibêjin "welatparêz" an ji "welatparêzek baş e" nas dikim. Bi salan ji, di jiyana xwe de, di nav rôxistineke welatparêz de cih negirtine. Li derf rôxistinan ji, bi madî û manevî alîkariya tu rôxistinekê nekirine. Kesên wiha di jiyana xwe de, li dijî rôxistinî bûne û iro ji, li dij in. Ji bo xwe, bi heq derbixin av li ser hezar aşî digerînin. Bêbaweriya rôxistinî belav dikan.

Ji bo welatparêziyê divê rengek, wesfek, teorî û pratîkek hebe. Divê pîvanek hebe. Bi termînolojiyeke bêmane û vala welatparêzî nabe. Jê re sînorek lazim e. Ev sînor ji dîtin û rewş ci dibe bila bibe, li gor imkan û quweta xwe li dijî dijmin rawestandin e. Berxwedan e. Têkoşîndayîn e.

Kirine. An ji çend sal berê kirine, lê ji 10-12 salan ve, xwe ji kar û barê welatparêziyê dûr dane û didin. Tobe kirine. Bi dîtina min mirov ji kesên wiha re dikare bibêje "berê ew welatparêz bûn", dê gotin di cihê xwe de be.

Niha heta ku ji destê kesên "welatparêzên baş" tê zarok, mirov û der û dorêne xwe ji têkoşîna neteweyî dûr dixin. Li welat di dema qirkirinê wek Helebçe, Şîrnex, koçbarî û tengzariya Başûr de carek be ji, li derê welat besdarê meş, mitîng û kampaniyê alîkariyê nabin. Lî, disa ji ew kesên wiha "welatparêz" an ji "welatparêzên baş in".

Welatparêzî li gor wext û şertan dikare bê guhertin. Dema ku biyanî, welatê mirov dagir û talan bikin divê mirov zêde fedekar be. Li her derê dinyayê di rewşen wiha de, bi metodêne din re, pirraniya xelkê li dijî dagirker û talankaran dest davêjin çek. Dema welat serbixwe be û rejîm paşverû û faşist be, divê mirov li dijî rejîmê muxalefetê bike. Dema welat azad û serbixwe be ji, disa welatparêzî ranaweste. Divê welatparêz wê demê ji, welatêne xwe ava û xweş bikin. Ji bo pêşketina welat kar û xebat bikin.

Welatparêzî ne bi tenê ji bo şerê neteweyî yên rizgarî ye. Welatparêzî ji welat û xelkê xwe hezkirin e. Ji bo rizgarî, azadî, wekhevî û mafdariya hemû mirovan e. Ji bo nan û azadiye ye. Ji bo azadbûn û başbûna rewşa welat û mirovan xîretkirin e. Taqetkirin e. Têkoşîndayîn e. Ev ji mirov nikare ji her kes an ji, ji her hemewlatiyî di eynî pileyî (dereceyî) de fedekarî û gehremaniye bixwazî û bipêyi. Her kes li gor şert, imkan, taqet, qebiliyet, zanabûn û cesareta xwe besdarê têkoşînê dibe. Herwiha gel hêzên xwe yên madî û manevî dike yet.

Bi dîtina min, ew kesên ku bi asgarî van şert û şûrten welatparêziyê bi cih neanîne û nayînîn, mirov nikare ji wan re bibêje "welatparêz in." Yanî ji bo welatparêziyê divê rengek, wesfek, teorî û pratîkek hebe. Bi termînolojiyeke bêmane û vala welatparêzî nabe. Jê re sînorek lazim e. Ev sînor ji dîtin û rewş ci dibe bila bibe, li gor imkan û quweta xwe li dijî dijmin rawestandin e. Berxwedan e. Têkoşîndayîn e. Dilxwestin û welatparêzî ne yek tişt in. Li tu cihekê dînîye, ji temâşevan û dilxwazan re negotine welatparêz. Yanî ew kesên ku destêne wan ne di ava sar û germ de be, ew welatparêz in? Mirov yên yekê ji, di termînolojiya siyasiye me Kurdan de dibîne. Ev ji, ji termînolojiya siyasi re bila xela-me be. Ma ci dibe, dînya diqede an ji diqelibe?

Pirsgirêkên zimanê Kurdi

Gavan Koçer

Gelê Kurd iro di merhaleyeyeke nû de ye. Em dikarin ji vê merhaleyê re, merhaleyâza yinê ji bibêjin. Ji ber ku ew ji her alî ve ji nû ve dizê, dipişki ve û fêkiyan dide. Ji nasîna kesiyanâ xwe heta nasîna jiyana civakî wiha ye. Lî mixabin di destpêkê de hewcâyê gelekî nebûnan e. Dixwaze zû bigîhe, mezin bibe, lê xwarin kêm e. Yek ji wan xwarinê kêm ji ziman e. Zimanê ku bikaribe pê tiştan bixwaze û pêk bîne. Beriya zayına wî kurmân zikê diya wî, mêtîne, lewma ji ew bi kêmeşiyen hatiye gerdûnê. Ji wan kêmeşiyen yek ji navgîna axaftina wî ye.

Belê zimanê Kurdi wek ku em dizanin ji zêdeyî 70 salî ye qedexe ye û ji xwe berê ji, di rewşeke rind de nebû. Bi bilindbûn û geşbûna şerê rizgariyê re, ew ji wek babeteke gi-ring ket rojeva civaka Kurd. Her çend iro bi Kurdi tê nivîsandin ji, zimanê Kurdi di navê de wek pirsgirêkeke gi-ring disekine. Ji ber ku hê zimanekî hevgirtî û gelêri, ku hemû gelê Kurd wek zimanekî hevpar bibîne, pêk nehatîye. Di vi warî de gelekî gengeşî hene û ji hev cudatir raman û pêşniyar têne leckirinê. Yen herî mezin ji di warê alfabeaya Kurdi, rastnivîsandina Kurdi û afirandina zimanekî gelêri de ne.

Ji ber ku em bikaribin babetê bi dorfirêhî binirxînîn, divê em çend gotinan li ser ziman û zaravayê Kurdi bibêjin.

Zimanê Kurdi ji aliye morfolojiyê ve dikeve nav malbata zimanen Iraniyan ku mirov di avahiyen hevakon û gotinan de hêşantir dibîne. Wek ku têzanîn, zimanê Kurdi ji çar zaravayê bingehîn pêk tê. Kurmançî, Dimîlî, Soranî û Goranî. Ev skîleta, zimanê ku em jê re Kurdi dibêjin pêk tînin û xwedî hinek taybetiyan in. Anglo her yekî hinek xîsûsiyet û celebêne wan hene ku wan ji yên din didin cudakirin. Ev taybetî, hem di warê fonetikê û hem ji di warê morfolojiyê de ne. Lî ev ne tenê ji bo zimanê Kurdi ye. Li ser gerdûnê gelêne ku qedera wan nêzî qedera Kurdan bûye, zimanê wan ji wek Kurdan cûda bûye. Mirov dikare wek minak Samiyan, ku li Norwec, Swêd, Finland û Rûsyayê di-

jîn, bide. Samiyen ku Samiya bakurê qise dikan, ji Samiyen ku Samiya başûrê qise dikan, fêm nakin.

Wek ku dîrokzan û ziman-zan didin diyarkirinê, sedemê ev taybetî û celebêne cûdayî, girêdayî proseseke dîrokî ne. Yanê hindek faktoran nehişte-ne zimanekî hevgirtî pêk were. Li vir mirov dikare zêdetir behsa avahiyen erdnîgariyê, rista ola îslamê, tesîra zimanen herêmê, şeklî jiyana Kurdan û bi Kurdi nenivîsandinê (Kurdi nebûbû zimanê nivîsê) bibîne, ku girêdayî dîroka çanda Kurdan û rewşa politikî ye. Her çend di sed sala 1500'an de bi Kurmançî hatiye nivîsandin ji, ev neketiye radeyeke rîk û pêk ku bigîhe hemû Kurdan. Jixwe dîroka cûdabûna zaravayê Kurdi, ji vê kevtir e.

Her çend Kurd ji hev fêm nakin ji, em hê ji nizanin di formê de zaravayê Kurdi çiqas ji hev dûr in. Ji ber ku hê ji lêkolîneke bi rîk û pêk digre, yên din dîbin wek zimanen alîgir. Di zanîngehan de ji zaravayek rola zimanê neteweyî digire, yên din ji li ser xwe dikarin bibin besen lêkolînê.

Ji ber çend sedeman em di karvaniyê (pratîkê) de, bikarînâna xala yekemîn giran û dirêj dibînîn. Ew rewşa ku Kurd iro tê de ne, karê pêkânnâna zimanekî hevpar geleki zor dike. Berî her tiştî Kurd iro di bin bandoriya çar-pênc dewletan de dijîn û bi sê alfabeyle ji hev cûda Erebî, Kirîlî û Latinî, dînîvisin. Gelo yên ku bi alfabeyle ji hev cûda dînîvisin, dev ji vi karî berdidin? Pêşveçûna civaka Kurdan ji, ji prosesêni ji hev cûda derbas bûye. Ev ji, di vê merhaleyê de hoyen çekirina zimanekî neteweyî kêm dikan. Kurd hê nebûne xwedî otorîteyeke navçeyî. Em bi xwe otorîteyeke ku têkiliya civakê ya bi lêkolînê ve, ku têkiliyeke diylektikî ye, nagire berçavan, xwedî rûmet nabînîn û otorîteyeke wiha ji bo pêşeroja civakê ji baş nabînîn. Iro hinek Kurd pirraniya wan ji Kurdên ku li derve dijîn, welat ji, ji wan yek e, dixwazin bi weşanen wek kovar û rojnameyan alfabe û zaravayan nêzî hev bikin, da ku bi vi awayî bikaribin di pêşerojê de zimanekî Kurdi yê hevpar pêk bînîn. Ev karekî hêja ye, lî girêdayî prosesekî geleki dirêj e.

Ger yên ku Kurmançî qise dikin ji sedî 50'ye nifûsê pêk bînîn, rola zaravayê ji dibe ji sedî 50. Lî ev karekî teknikî ye.

Yanê, em bibêjin pirraniya Kurdan ji zaravaya Kurmançî fêm dike, wê çaxê giranî tê ser vê zaravayê. Nûçeyen neteweyî û hin karên girîng bi vê zaravayê têne çekirin. Lî di civata lokalî de her herêm zaravayê xwe bi kar tîne. Li herêm Dimiliyan Dimîlî, ya Soranan Soranî û ya Kurmançan ji Kurmançî dibe zimanê lokalê. Weşanen lokalî her wiha têne bikaranîn. Bi vi awayî her devok ji dikare li herêma xwe bê bikaranîn. Wê çaxê Dimiliyan Qerbegânê nabêjin, em ji devoka Dimiliya Dêrsimî, an ji Kurmançen Semsûrê nabêjin em ji Kurmançya Botanê fêm nakin.

Di xwendegahan (dibistan, dibistana navîn û lise) de ji her wiha dibe. Hemû zarava fermîne, lê zaravayê herêmê giranî digre, yên din dîbin wek zimanen alîgir. Di zanîngehan de ji zaravayek rola zimanê neteweyî digire, yên din ji li ser xwe dikarin bibin besen lêkolînê.

Ji ber çend sedeman em di karvaniyê (pratîkê) de, bikarînâna xala yekemîn giran û dirêj dibînîn. Ew rewşa ku Kurd iro tê de ne, karê pêkânnâna zimanekî hevpar geleki zor dike. Berî her tiştî Kurd iro di bin bandoriya çar-pênc dewletan de dijîn û bi sê alfabeyle ji hev cûda Erebî, Kirîlî û Latinî, dînîvisin. Gelo yên ku bi alfabeyle ji hev cûda dînîvisin, dev ji vi karî berdidin? Pêşveçûna civaka Kurdan ji, ji prosesêni ji hev cûda derbas bûye. Ev ji, di vê merhaleyê de hoyen çekirina zimanekî neteweyî kêm dikan. Kurd hê nebûne xwedî otorîteyeke navçeyî. Em bi xwe otorîteyeke ku têkiliya civakê ya bi lêkolînê ve, ku têkiliyeke diylektikî ye, nagire berçavan, xwedî rûmet nabînîn û otorîteyeke wiha ji bo pêşeroja civakê ji baş nabînîn. Iro hinek Kurd pirraniya wan ji Kurdên ku li derve dijîn, welat ji, ji wan yek e, dixwazin bi weşanen wek kovar û rojnameyan alfabe û zaravayan nêzî hev bikin, da ku bi vi awayî bikaribin di pêşerojê de zimanekî Kurdi yê hevpar pêk bînîn. Ev karekî hêja ye, lî girêdayî prosesekî geleki dirêj e.

Jiyanek ji Kurdan û edaletê re hatiye îthafkirin:

Xebatê Dr. Vera Beaudin Saeedpour

Mesaja Dr. Saeedpour: "Ev Kutubxane û Muzeya Kurdi ku li Amerika ye bi girîngi dide xuyan ku civaka Kurd di dîroka Rojhilata Navîn de û ji çanda dînyayê re alîkariyeke girîng kiriye û bûye xwedî cihekî birûmet. Ev herdu sazgeh weke abîdeyeke çandî û dîrokî disekinin. Min ev Muze û Kutubxaneyê tevî xebatê xwe yê deh salên dawî ji hezkirina civaka Kurd û ji bo bîranîna mîrê xwe Homayoun Saeedpour re diyarî û îthaf kiriye."

Dr. Vera Beaudin Saeedpour ji na Homayoun Saeedpour ku Kurdeki ji Sanandaj e. Ew bi xwe Amerikanî ye. Di 1981 û de mîrê wê Homayoun Saeedpour wefat dike. Ji wê rojê û pê ve xwe dide ser xebata çand û dîroka Kurdan. Dr. Saeedpour endama cemiyeta "Phi Beta Kappa" ye ku di Amerika de a herî navdar e. Ji Universita Vermont di beşa Civaknasiyê (sosyoloji) de lisans û di warê Perwerdehiya Felsefeyê de mastir kiriye. Di sala 1976 an de ji Universita Colombia di şaxê Perwerdehiyê de doktora standiye.

Piştî mirina mîrê wê (1981), Dr. Saeedpour ji bo hebûna Kurdan û rewşa jiyanan wan a nexwêş berbiçav bike gelek xebat kir. Di 1986 an de Muze û Kutubxaneyâ Kurdi vekir. Ev herdu sazgeh li rojava bêhempa û xwedî cihekî bi rûmet in. Eyaleta New Yorkê belgeya müadeletê daye van herdu saziyan. Piştî vê ji Dr. Saeedpour li Amerika ji bo piştgiriya Muze û Kutubxaneyê di 1990 an de "Weqfa Mîrasa Kurdi" ji damezirand. Endamîn Rêveberiya Weqfî ji gelek kesan pêk tê: Mustesarê Giştî yê Berê yê Neteweyen Yekbûyi Sir Brian Urquhart, Senator Edward Kenedy, Senator Claiborne Pell, Senator Alfonse D'Amard, Endamîn Meclîsa Temsilvanan; Robert Dornan, Tom Lantos, John Porter, Prof. Wheeler Thackson û Prof. Richard Frye; ji Universita Colombia Dean Grafton Nunes; ji Universita Princeton Prof. Richard Falk, ji Universita Georgetown Robert

Drinan, Xwediya Xelata Nobelâ Elie Wiesel û jina Evdrehman Qasimlo Helene Krulich Qasimlo.

Kutubxaneyâ Kurdi ji her derver dînyayê bala lêkolînvan, rojnamevan û saziyên resmî dikişine. Di vê saziyê de ji bo nivîskar û lêkolînvanen ku li ser Kurdan dînîvîsinin 'Navenda Légerinê' heye. Di nav koleksiyonê Kutubxaneyê de pirtûk, rapor û xerite; ji malzemeyan jî slayt, fotografi û vidyo hene. Di vê Navendê de dîrokeke devkî ku ji serpêhatiyê insanan berhev kiriye tê qeydkirin.

Li ser dîrok, çand û têkiliyên hemdem yê Kurdi kovareke ku ji şes mehê carekê bi navê "Kurdish Times" û kovarek ji 3 mehê carekê analîz û xeberan rojane dike bi navê "Kurdish Life" ji alyî ve Kutubxaneyê ve têne weşandin. Ev herdu weşan bi abonetiyê bi destê herkesi dikevin. Cara yekemîn pirtûka pêşgotinîn Kurdan bi Îngîlizî ji alyî ve Kutubxaneyê ve hatiye çapkirin.

Ji Universita Harward Dr. Mehrdad Izady berpirsiyar û şîrikê rêveberiya Weqfa Mîrasa Koleksiyona Muzeya Kurdi ye û pirtûk bi navê "Kurdan" ku tê de behisa jiyanan Kurdan ya buhurî tê kîrin nivisi ye. Ev pirtûk bi kurtahî lê bi lêkolînî hatiye nivîsin. Muceherat, xaliyên kevn, kostum, dokuman, tiştîn bi dest çekirî, muzîk û berhemîn hunerî di nav esyayen ve Muzeyê de ne. Şanoyek Dansa Kurdi ji di bin parêziya Muzeyê de dixebe.

Însanen hunerperwer yê di

vî warî de ci Kurd ci ne Kurd gelek alîkariya ve Muze û Kutubxaneyê dikin.

Mesela; nebiyê Serokê Amerika Theodore Roosevelt, Archibald Roosevelt ji Komara Mehîbadê koleksiyona kovareke bi qîmet diyarı ve Kutubxaneyê kiriye. Muntaha Zaza xaliya ji daweta pîrika xwe diyarı Kutubxaneyê kiriye. Û dapîreke Kurdan ji gundê xwe gerdeniyeke ji kevir diyarı Kutubxaneyê kiriye. Dr. Saeedpour ji bo vê pîrê dibêje ku, "Her car bi diyariyên wiha Muzeya me ges dike."

Dr. Saeedpour li Ewrûpa û Amerika gelek nivîsan nivîsiye û gelek ders dane di vî deh salên buhurî de. Gelek caran besdari bernameyên radyo û televizyonan bûye. Dr. Saeedpour di dema me de di Rojhilata Navîn de însaneke pirr jîr û ges tê nasîn.

Dr. Saeedpour di warê zanistî û lêkolînî orjinal de xebatê dorfireh û giřing kiriye. Di nava salên 1970 yan de Dr. Saeedpour di ferhenga Oksford a Standard, Random House û di Scribers de wate (manî) ya bêjeya 'Kurd' sererast kiriye.

Ji xeynî van xebatê zanistî Dr. Saeedpour der heqê Kurdan de gelek nivîsan nivîsiye û nameyên wê yê ku ji bo Kurdan weşandiye di gelek rojnameyên Amerika de li ser hev hatine weşandin. Dr. Saeedpour pirr alîkari bi "Genocide Watch" re kiriye ku ev weşaneke Universita Yale ye li Amerika.

Dr. Saeedpour ji bo ku e-dalet ji temamê gelên dînyayê re bê damezirandin gelek xebat kiriye û di vê mijarê de wiha dibêje: "Her insan careke tenê tê dînyayê û dijî. Ev rastî divê ji alî tu kesî ve neyê jîbirîkirin. Hemû ol û neslîn însa-

nan dibin cure û dewlemedî ji bedena zanistiyê re. Divê em zewqeke mezin ji vê rastiya jiyanê bistînin. Bi vî awayî em ci ji xwe re bixwazin divê em ji yê derî xwe re ji wê bixwazin." Ev prensib bingehê baweriya Dr. Saeedpour e.

Mesaja Dr. Saeedpour: "Ev Kutubxane û Muzeya Kurdi ku li Amerika ye bi girîngi dide xuyan ku civaka Kurd di dîroka Rojhilata Navîn de û ji çanda dînyayê re alîkariyeke girîng kiriye û bûye xwedî cihekî birûmet. Ev herdu sazgeh weke abîdeyeke çandî û dîrokî disekinin. Min ev Muze û Kutubxaneyê tevî xebatê xwe yê deh salên dawî ji hezkirina civaka Kurd û ji bo bîranîna mîrê xwe Homayoun Saeedpour re diyarî û îthaf kiriye."

Dr. Vera Beaudin Saeedpour di 27'ê Adara 1930 yan de li Barre Vermont hatiye dinê. Diya pênc zarakan e. Di sala 1972 an

de ji Universita Vermont di beşa Sosyolojiyê de lisans kiriye. Di 1973 yan de di warê Perwerdehiya Felsefeyê de mastir kiriye. Di 1974 an de ji Universita Vermont di beşa Perwerdehiyê de Sertifika Pêşketinê distîne. Di 1976 an de ji, di Universita Colombia de, di warê Perwerdehiyê de doktora dike. Dawî dibe endama Phi Beta Kappa.

Xebatê wê yê ji bo Kurdan: 1981: Damezrenê û rêvebira Programa Kurd.

1986: Rêvebir û damezrenêra Kutubxaneyâ Kurd.

1988: Rêvebir û damezrenêra Muzeya Kurd.

1991: Rêvebir û damezrenêra Weqfa Mîrasa Kurd ya Amerika.

Ji xeynî van xebatan, li Universite û sazgehîn demokratik gelek ders û seminar dane û di rojnameyan de nivîsen wê derkîne. Çend program ji, ji bo televizyonan çekirine.



Dr. Vera Beaudin Saeedpour: "Em ci ji xwe re bixwazin divê em ji yê derî xwe re ji bixwazin."

REWSEN DERDIKEVE

Hejmara Taybetî (154 rûpel) ya kovara Rewsen (organâ YRWK-Ewrûpa) di demeke nêzik de di nava desten xwendevanan de ye.

Bêhtîn 50 nivîskar ji her çar parçeyen Kurdistanê di nivîsandina wê de cih girtine.

Kovar bi naveroka xwe dewlemedî e.

Ev hejmar a dawiyê ye ku YRWK dertîne.

Rewsenê bixwînin, biđin xwendin....!

Modeya cilan ji aliye fotomodelan (manken) de, bi awayek xemilandı, bi rengê cur be cur, bi xort û keçen bedew, bi neqş û fesalén nû, bi tama burjûvaziyeke qurre û bi xwe ewle, her sal derdikeve bazarê. Cil û modeya ku sala berê pirr xweşik û bi fesal bûn, ısal kevn û demo-de bûne... Reng û fesala wan, bersiva demê nade. Dem û pêşketin, reng û fesalén nû dixwaze. Mirov, hewcedarê xwenûkirinê ne... Wek tê zanîn, her sal ev merasim, bê ku ruyê tu mirov sor bibe, bê ku kes ji xwe bipirse: Çima? Tekrar dibe. Kesê bê bawerî û bi xwe ne ewle, li gor modeya sal û mehan, pîvan û tamên xwe diguerînin. Ji ber ku mode wiha dixwaze...

Ma gelo di nava salekê de ci hatiye guhertin?

Di rastiya xwe de, hewcedarîn mirovan ên bingehîn, ne-hatine guhertin. Lî sermayaya modeya navneteweyî dixwaze bi mirovan bide bawerkirin ku, hewcedariyên bingehîn hatine guherandin. Lî ev realita berbiçav baş nişanî mirova dide ku, modeya cilan ji aliye ve, bûyerêkî psikolojik e. Mirov, di atmosfera modeya cilan de, bi awayekî din bi ser dikevin. Aqil dije tatîlê û tecrûbe ji bêhna xwe vedikin û ji aliye ve jî hisê mirovan dibin, muxtarê gund. Di rewsek wiha tevlîhev de, munaqeşeyen fikri zor dikarin bigihîn armancen xwe. Monolog dikeve şûna diyalogê û herkes dibêje: "Min got û te got!"

Modeya cilan û modeya fîkrîn politik, ji pirr aliyan ve,

Kurdistan di Rojhilata Navîn de warekî kevnare ye. Bi aliye kaniyen sererd û binerd ve ji herî zengin e. Vê dewlemendiya qedim bala dijminan gelek kişandîye. Av û deravên boş, deşt û zanen berfireh, keriyen mihan, reviyê dewaran, garanen heywanan û birc û kelehen çiyayan, gelek caran bûye sedema talan û dagirriyê. Em dikarin bibêjin ku gelê Kurd iro dîlê (esîre) dewlemendîyen welatê xwe ne.

Talankerên Emewî, Ebbasî, Moxolî, Selçûqî, İranî û Osmani dema birçî diman, an ji rewşa aboriya welatê wan xerab bûbûya, êrisen xwe dianîn ser Kurdistan. An ji, li gel hevûdu li ser xaka Kurdistanê ser dikirin. Çebûna Şerî Melazgirê, Milêngiya, Çildérane, Nizipê û yên din, di nav mulk û warê Kurdistanê de bi tesadûfî nîn e. Di wan hemû seran de ji Kurdistan, bûye afirê (êmlîkê) kedwarên Tirk, Ereb û Faris. Iro ji şer, şerî mêtina Kurdistan e. Dewlemendiya girêdayî talan û mêtin e. Perdeyê xistine serçavêwan wan. Wan azadî û serbestî ji bo xwe tenê divê.


Hem ji bo gelê Kurd û hem ji, ji bo hindikahiyan (egalite) hem-welatiyên xwe, mafê jînê û mirovahiyê ji nas nakin. Li vê dinyayê,

Moda xayîntî ye!

dişibe hevûdu. Kesê ku li polîtikayê weke modeya cilan temâse dike, hewcedarî bi guherandinê şiklî dibîne. Guherandin, ji aliye ve, dibe ji bo guherandinê. Bê prensibî û oportünizm, weke sixleten başyan tê nişandan. Kesê wiha pirr caran dibêjin: "Doh doh bû iro jî iro ye." Em doh bê aqil bûn û iro jî em bi aqil bûne(!) Di rastiya xwe de bi aqilên iro, bê aqilên sibehê ne. Kesê bê aqil û bê prensib hergav bê aqil û bê prensib in...

Di navbeyna salên 1975-1980 an de, pirr kes û komik, komele û partî bi navê marksizm û sosyalizmê dipeyivin. Di civaka Kurdish de, reqabetekê mezin hebû. Gundî û karker, xwendekar û karmend. Kal û xort, jin û mîr, axa û rîncber, mîrkuj û qaçaxçı, erê hemû kesen bi rih û bê rih, bi navê sosyalizmê politika dikirin. Bi taybeti serokatiya vî karî jî, rewşenbirê Kurdistan dimeşandin.

Ma gelo ji bo gelê Kurd ku bi sedsalan bindest maye, jiyanekî hejar û perîşan derbas kiriye, tu riyan din hebûn? Bi raya min, tu riyan din tune bûn. Rewşa Kurdish ya sosyal û dîroka Kurdistanê, tu riya din ji gelê Kurd re nehiştibû. Ji ber vê yekê jî, gelê Kurd rewşenbirê xwe tenê nedîhiştin û didan ser şopa wan. Pirsa neteweşî û pirsa sosyalizmê, li Kurdistanê bi hev re meşyan, sosyalizm dest pê kir li welatê me bibe mode. Kevneperesten Kurdistan ên ku bi salan şerî sosyalizm û pêşverûtiyê dikirin, di şeveke tarî de qulupîn û bûn sosyalist. Paş re qîma wan bi vê jî nehat û dest pê kirin gotin: "Em marksist- leninist in!" Fotomodelen ku bi navê sosyalizmî derketin bazarê, roj bi roj bi şiklîn cur be cur politika dimeşandin. Hinek bûn serok-eşîren sosyalist, hinek bûn dewlemendîn sosyalist, hinek bûn tolazîn sosyalizmê, hinekan bi navê sosyalizmê dawa mezhebtîyê dimeşandin, hinekan jî, ji bo sosyalizmê bazirganiya eroînê kirin! Bi kurtaşı mirov dikare bibêje; çiqas pîsi, lewitanin, kompleks, cehalet û menfacten kesayetî ku li welatê Kurdistan



hebûn, di bin navê sosyalizmê de organîze bûn. Sosyalizma ku tijî kultur, humanîstî, zanyarı, mirovatî û tijî hezjekirin bû, li welatê me serûbin bû. Li şûna kultur, qurreti û dogmatizm bi pêş ket, li şûna hezjekirin, zikresi û dijiminayeti, li şûna zanyarı jî, oportünizm bi pêş ket. Li şûna ku militanen Kurd xwe li gora kultura sosyalist biguheerin, sosyalizm kiran weke xwe!

Pirr kesen ku doh bi navê sosyalizmê dipeyivin, iro bûne heyranê Amerika. Kesê ku beri niha bi çend salan berê xwe didan Sovyetê, iro Amerika û Ewrûpa ya sermayedar ji xwe re dike Mekkeya nû. Li gor wan sosyalizm iflas kiriye. Sosyalizm edî nema bi kîrî Kurdistanê tê. Modayek nû (di rastiya xwe de

pirr kevn!) ku bi hemû awayan dibiriqine, ji welatê me yê bindest re pêwest e...


Mirov dikare bibêje ku, li welatê me pirr babeten xayîntiyê hene. Bi taybeti dîroka Kurdistan tijî xayîntî ye. Ji aliye ve li berxwedan û welatperwerî û ji aliye ve ji xayîntî. Ji aliye ve Kurdperwerî û ji aliye ve xwefirotin... Ez carna difikirim û dipirsim: Gelo xayînen Kurdistan ku mirine, ger iro li jiyanê bûna, wê ci kiribana? Ma gelo ewê disa xayîntî kiribana? Ma gelo mirovan ewê disa bigotana: Feleka xayîn!.. Bi baweriya min, na! Ez bawer im ku xayînen neteweyî, ewê iro posman bibûna...

Xayînen sosyalizmê jî, wê rojekê posman bibin. Ji ber ku aqil wisa dibêje û dîrok û zanyarı jî, wisa dibêje. Ji ber ku welatê me yê bindest wisa dibêje û zehmetkeshen me jî, wisa dixwazin. Cihana me; ya wê ber bi sosyalizm ve biçe, ya jî roj bi roj ewê barbarîr bibe. Modeya xayînen sosyalizmê jî, kîjan cila li xwe bike bila li xwe bike, çawa xwe bi xemilîne bila xwe bi xemilîne, kîjan rengî bide xwe bila bide xwe, kes nema bawerî pê tîne. Dawiya modeya xayînen sosyalizmê jî, wê di wextekî nêzîk de bê.

Cihana me, iro ji hemû deman bêhtirîn, hewcedarê sosyalizmê ye!

Serefyan Ciziri

Di vî şerî de dagirker neheq in



Qesra Ishaq Paşa Agîri/Bazîd

bi sedan qral, împarator, xanedan hatin û çûn Kursiyen Bexda, Tahran û Enqereyê ji dê hilweise. Her weke serpêhatiya jêr ji diyar dike, tişte ku li paş mirov dimîne qencî, çakî, camêri, mirovahî û dostanî ye.

Dewlemendiya Qralê Lîdyâ Kroisos (Karûn) hîn jî di dînyayê de yê herî mezîn tê qebûlkirin.

Kovana gelek kesen lêgerînvan

û vekolînvan, gencînxaneya wî ye.

Qral bi maldariya xwe gelek şanaz bû. Hizra mirin û ketina xwe nedîkir. Dixwest di civatan de ji herdem behsa wî û dewlemendiya wî bête kirin.

Di dîwanekê de gote Solon:

-Di vê dînyayê de kesek ji min dilşadîr heye?

Filozofî fama û zana:

-Tu tişten bi rih dilşad nîn in.

Qralê germ tu tişt ji bersiva Solonê Atînayî fêm nekir. Gotina Solon di guhekî wî de çû di yê din de derket.

Çend sal bi şûn ve Persî çûn bi ser Lîdyaiyan ve, serbajarê wan Sordes wêran kiran û Kroisos jî dîl girtin.

Qralê Persiyan Kyros ferman da ku wî bavêjin ser koma êgir û bişewitînin.

Dema Kroisos dest û piyên wî bi zincîran ve girêdayî avêtin ser agir, sê car kire gazi:

-Solon, ...

Ev rewşa wî bala Kyros kişandî. Ji zilamîn xwe re gote "Ka jê bipirsin bê ci dixwaze? Li ser pirsa wan Kroisos, şireta ku Solon lê kîribû û ku ew jî lê guhdarî nekiri bû ji wan re got:

-Ger ku min guh bida wî, ew ji bo min, ji xezînê herî mezîn jî buhatir bû.

Li ser van gotinan Kyros ji nerm bû. Peyvîn Solon weke derziyan di laşê wî de çûn.

Hizra xwe kir ku, ya iro hatiye serê Kroisos dê rojekê bête serê wî jî. Emir da û agir da vesniran-

din.

Ji Kroisos pîrsî:

-Te cîma li hemberî min, li şûna riya dostaniyê, şer bijart?

-Kesek ewqas dêhn nîn e ku, hindî aşti hebe, riya şerî hilbijere. Di aştiyê de kur bavê xwe binax dîkin. Lî di şeran de bav kurên xwe dixin goran. Bê guman ev li xweşa Xwedayan diçû.

Belê di demen kevin de xwedenan şer û qurban dixwestin. Lî iro ji sermayedar û zordesten Ereb, Tirk û Fars dixwazin bi Kurden bindest re şer bikin. Ji xwin vexwarina Kurdistan qet tê nabin.

Di vî şerî de dagirker neheq in. Li şûna riya dostanî û biratiyê, riya şerî hilbijartine. Mixabin hindî qraleki 2500 sal berê jî hevalbendîn qencî û çakîyê nîn in. Naxwazin agirê qetliamî, qırkırinê, bi riya eqil ve bitemirînin.

Bihêle vemirandinê, roj bi roj vî agirî li ser pişta gelê Kurd ges dîkin. Lî, nîzanî agir hilkirin nîşana rizgariya neteweya Kurd e. Gerîlayen Kurd bi xwe hemû bîrûsk û çîrûsk in.

Behzad Berçelani

Hêviya Hêvîn

ÇIROK

Li kêleka bajêr, li hêla rojava, gundekî mezin bû, malen gund û yên bajêr tevlîhev bûbûn û bi hevdû re bûbûne yek, ji lew re jê re ne digotin "gund" anku ew ji êdî bajar dihate hesab. Mirovên vî gundî bi welatparêzi xwe hatibûn naskirin, nexasim piştî ku rama na serxwebûnê derbasî wê navçeyê bûbû. Gelek şoreşger û qehremanen mezin jê derketin, ji lew re ji bûbû nîşana noker û sîxuran ku, di xwestin her dem tevlîhevîyê di wî gundi de biçinîn.

Mala Hêvîn ji malen pêsemîn bûn ên ku, şoreşger hemêzkinin û hetanî dewiyê deriyen xwe ji wan re vekirin. Hêvîn ji keçekte di 7-8 salen xwe de bû, keçekê wiha bû, di hembêza şoreşger de mezin bûbû û li ser pêşîren partiyê hatibû xwedikirin, ji lew re, tevger, rabûn, rûniştin û danûstandina Hêvîn mîna yên kadroyeki bûn. Dema ku welatparêz di civiyan û hevalekî li ser rewşa dawî xeber dida, Hêvîn hêdi hêdi bi wan tiliyên desten xwe yên biçuk li derî dixist û des-tura derbasbûnê ji hevalan dixwest, piştî ku derbas dibû, li enîşkekê û li ser çokekê rû-diniş, zeniya xwe dixiste nav her dû lepen xwe yên nazik û teze. Çavên wê yên biçuk di nav tayen porê wê de winda dibûn û reşbûna çavan û teriya porê wê tev li hev dibûn, heya dawiyê mejî, guh û dîna xwe dida devê hevalê ku deng dikir. Piştî ku civîn diqedîya her mîna mezinan desten xwe bilind dikir û pirsên xwe diki-rin, wiha bi şiranî mîna kevo-kan xwe davete nav dilê mirov.

Hêvîn tu carî mîna zarokan li xwe ne dinêri, xwe ji rêza

zana û şoreşgeran dijimart, ger ku carna tiştin (tiştina) dikirin, wiha digot: "Hevalno... Min ev kîmanî kiriye, ez xwe rexne dikim, ez soz didim ku ezê li ser xwe bi sekînim."



Wêne: Dilxwaz (1992)

H. SEFKAN

bibin...?

- Xwediye vî karî ji heye. Hêvîn û bavê xwe derketin, saet 9 ê bi şevê ye, dem zivis-tan e, baran; erd û ezman dibare, mirov heyânî çongê (çok) di nava heriyê de di-çe, lê Hêvîn hemû tişt ji bir kir, tenê ma di mitala Hêvîn xwe de ku xwe bi çiyan bigihî-ne. Bê tirs da pêsiya bavê xwe, çend ga-van çûn, hino hino çongê Hêvîn sist bûn, heyânî ku êdî bavê wê bi destê wê gert, hingî ku westiya û mijûl dibû, zû bi zû bi mesela bavê xwe nehisiya, ku berê wê daye mala metika wê, dîna ku Hêvîn dît, ku bavê wê li deriyê mala Metika wê dixe.

- Bavo...
Ev mala met

ka min e..!

- Erê, ez dizanim...!
- Ma çiya, gerîla û Kurdistan di mala metika min de ne...?

- Na emê hinekî xwe vehe-sinin û paşî emê herin.

- Lê tiştê ez zanim, niha tarî ye, baran e û eskerê Tirk newêrin ji kozikan derkevin, wextê herî minasib niha ye ku em derbasî piş...(berî ku go-tinê xwe bibe serî kurê metika wê derî vekir ji lew re goti-na, wê qut kir da ku ew nizâ-nibe bê wê évarê ci bikin.)

Rûniştin, çayek xwe ji vex-warin, lê Hêvîn natebite, her quîncakan dide bavê xwe, ya-nî işaretra rabûnê didiyê. Li dawî bavê wê, pê re got: "Keça min hin biçûkî, hinekî din xwe ragirê, bi soz wê li gorî dilê te hêvî û xwestekê te bêne cih.

Hêvîn serê xwa danî ser çoga metika xwe, hêdî hêdî çavên wê çûne ser hev û di hêviya zûbûna mezinbûna xwe de, kete xewê.

Hingî ku di mala wan de ev gotin û hevok dihatin gotin, mîna: Heval Lu... çû welat, hevalê H... wê here... heval E..X.. şehîd ketin ji lew re Hêvîn bûbû bi hesreta çiyayen Kurdisatanê, êdî mîna mezinan wisa digot: "Ma wê ken-gî dora min bê gelo? " Te di-got qey ev bûye 7-8 salen wê di nava xebata gîrsen gel de ye û êdî dixwaze xwe bi çiyê bigihî-ne.

Carekê bavê Hêvîn xwest ku pê şâ bibê, jê re got: "Heydê Hêvîn işev dora min û te ye, emê derbasî çiyê bibin, qerar wisa hatiye. " Dema çengî hemêza bavê xwe kir û ew maç kir, mîna ku çivîkej ji ser dilê wê bifire, ji kîfan re giriya û got:


"Kanîn cilên min yadê, ew cilên ku hîn hevala Bêrivan ji min re çekiribûn...? Ezê çawa bê cil herim...?

- Na keça min, wê heval li çiyê bidine me.

- È ma emê çawa derbas

AZADÎ

Abdurrahman Durre



Cahşikên Parîsê

Xwendevanen hêja, Parîs beriya her tiştî, tarîx, medeniyet, şoreş, Napolyon, Bastîl, Quleya Eyfelê, Çemê Sen'ê, Meydana Azadiyê, hêkel, avahî, dêr, birc, kela, şatoyen mezin û muhteşem, metro û cadeyên cur be cur, bajarekî modern, cazîb, geş û xweş tîne ber çavên mirov. Bi her tiştîn xwe, bi çand, dîrok û rewşa Ewrûpa, ya kevn û teze bi mirov dide dîtin û naskirin. Di eql, hiş û bîra mirov de bi cih dike.

Dema ku ez nû hatim Parîsê (7-1-1993), di bîr û xeyala min de jî, ew hebûn. Bi rastî ji wilô bû. Lêt tu derrî, di hisê min re derbas nedibû ku ezê li Parîsê leqayî cahşikan ji bêm. Heta ku hevalan ez gerandim û birim herêma "Girojan". Yanî cahşik, bênamûs, rezîl, bêexlaq, diz, serxweş, qellaş, pîs û gemarênu ku

ji sedî notê wan Ereb û reşik bûn û di dema cenga azadiya Cezayîrê de, bi gelê xwe re xayîntî kiri-bûn, bi dijmin re alîkarî kiri-bûn. Ji sedî dehê mayîn jî, Tirk, İranî musulman û ne musulmanen din bûn.

Lê, girojîn Cezayîrê, ji hemûyan pîstir, rezîltir, kêmîtir û adîtir bûn.

Piştî ku Cezayîr azad bûye, ew cahşikên bêşeref û gemar revîne Parîsê. Texmîn kirine ku wê patron û axayên wan (dewlet û hikûmeta Fransiz) li wan bibin xwedî û dîsa jî qût bidin wan. Lêt dewleta Fransiz ne li wan xwedî derketiye, ne jî, qût û lak (xwarina kûçikan) daye wan û ne jî wan pena-ber (multecî) hesibandine. Weke kûçikên bêxwedî, wan li kuçeyan serberedayî hiştine. Bûne rezîl û riswayê alemê, ketine kuçeyen Parîsê. Jin, keç û bûkên xwe difiroşin. Weke kûçikên gemar û har di-newitin, ku ji wan re li Parîsê dibêjin "giroj", yanî cahşik, bênamûs û xayîn.

Bi rastî jî, ku min ev bêşeref û bêheysiyetan dîtin, weke perda sinemayê, cahşik û xayînen Kurdistanê di ber çavên min re derbas bûn. Min dît ku dê ew jî di dem û mêjûyeke nêzîk de, di kuçe û kolanen Enqere, Bexda, Tehran û Şamê de, wilô rezîl, riswa, bêqedr û bêbuha bibin û bigevizin. Lêt bi ferqekî, ku ew jî ev e: Jin û keçen wan, dê wê adîtî û bênamûsiya mîrên xwe qebûl nekin û tifê rûyên wan ên bê ar û bê fedî bikin... Û naletê li wan bixwînîn.

Bi baweriya min, ev dîtin û berçaviya min a li Parîsê, ders û êbreteke pirr mezin e ji bo hemû cahşik û xayînen her mîletî. Divê, ku caşikên me yêñ hêja?! Xayînen me yêñ teres jî, ji vê yekê ders û êbretê bigirin... Hê ku cahşik in û nebûne nîrrê ker û der bi der.

Birêz Abdullah Keskin, di goteke xwe de li ser weşanên Kurdi rawestiye û rexneyê xwe gitine. Erê em bi rexneyê wî kîfîxwêş bûn, lê belê min nedixwest ku niviskarekî me yî giranbuha birêz Keskin di nava vê bûyerê de biçe û bikeve nava dijminay û dijberiya niviskaran. Bila rê bidine xwendevan, wê ji heq wan derkevin, kela dilê xwe û we, wê li wan hênik bikin.

Birêz Şerefxan Cizîri di goteke xwe de wiha gotiye (Rojnameya Welat hejmara:10) "Bila ne zimandirê, lê belê zimanzan bingeha wêje û zimanê me deyinin." Baweriya me jî ev e. Em jî di vê dîtin û ramanê de ne. Di rojnameya Welat hejmara 5'an de, birêz A.Keskin, hevpeyvînekî bi birêz Mehmet Uzun re kiriye. Di vê hevpeyvîne de mamoste wiha gotiye: "Ne bi lez û bez, lê bi plan û program, bi hev re, bi hevkariye tekûz, ji ber ku ziman, zimanê me hemûyan e. Pêşketina ziman, pêşketina me hemûyan e." Erê birayên hêja, diz û talanker divê ku bi lez û bez bin. Dema ku em bi dizan bihisin û xwendiyê malê bi wan şiyar bibe, wê çawa diziyê bikin, wê çawa talañan birevîn? Ew diz in, ew zimandirê in, ji ber vê yekê ew bi lez û bez in. Ewê ku wêje, rêzman û peyvîn Kurdî nizanibin, pirtûkan binivîsin, kovaran biweşin, helbestan binivîsin û li ser serê me bibine nivîskar û xwe bikine pêşengê danîna bingeha zimanê me, kesê (mirovê) ku nizanibe bi dîrokê, li ser serê me bibe dîroknas û dîroka me binivîse, ev zilmeke herî mezin e ku, bi gel û xwendevan di be. Xwendevan, li tiştîn balkêş, ji wan re nependî, bi fêde û di warê zanistî (ilmî) de wan rewşenbir bike, hayidar bike digerin û bi destê wan keve, wê bixwî-

Li ser weşanên Kurdi

I. OMERÎ

nin û wê derdora xwe jî bi ezi-minin (teşwîk bikin) i bi wan bîdin xwendin. Bi kurtî, wê li wan berheman xwedî derkevin. Lewre xwendevanê Kurd, birçiyê xwendina zimanê Kurdi ne. Weşan û pirtûkên ku bîr û baweriya wan pê bê, wê lê xwedî derkevin. Heger bi amblem, wêne û navêni li ser pirtûk û kovaran, girseyen gel û xwendevan bi-xapînin, ne rast e. Di domahiyê de wê xwe bixapînin. Nexusim va ye di destpêkê de xwe xapan-dine. Weke dizê ku xwediyê malê tewandar bike, bê çîma tu nehiştiyê, ezê mala te bi şîlinim, wiha li nivîskar û çapxaneyê ta-lanker hatiye û bi ser de jî, gef û guran li me dikin. Wê navê can-goriyekî (pakrewanekî) ku li ber dilê me şîrin e û giranbuha ye, lê em dizanin ku hêza wî şehîdi nagihije çapkîrina ferhengekê. Heger çavê wan ne li fen û hîla ye, bila çapkîrina ferhengê li hêviya Zanîngeha Kurdi bîhelin. Ferheng bi rîk û pêk, tekûz û zanistî çap bibe. Pêdiviya xwendevan bi ferhengeke wiha heye.

Ê birano, hevalno, ma qey-karekî din ji we nayê? De herin ji xwe re karekî din bikin. Ji bo vî karî, holê (meydanê) ji nivîskar û hunermendê misoger re berdin. Hûnê bîbêjin, ew bi hejmara xwe kêm in, têra vî karî nakin. Rast e, ew hindik in, lê bila rêziman, wêje, helbest û

berhemê wan ilmî bin, bi rîk û pêk bin, rast bin, gel pê hîni zi-man, wêje, dîrok û çanda xwe bibe, kêm jî bin, em bi hindika-niya wan qâl in. Xwendevan wê li wan xwedî derkevin, roj bi roj wê pirr bibin. Wê bêhn li xwendevanana jî fireh bibe. Wî çaxî kesek ji me kesekî din tewandar nake, bi dilekî şad, nivîskar wê binivîsin û xwendevan wê bix-wînin.

Ez navê wan nabêjim, lê ew xwe baş dinasin. Hînek nivîskarîn me yên qorziyan hene, ku tu vekolînê li ser wan bikî, ji xwe ne nivîskar in, belkî hûn pî-vaza jî, bi wan hûr nakin. Ku rî li wan teng dibe, nema zanîn çi binivîsin, di gotarê xwe de qala jiyana xwe û bûyerên li wan qewimîne dikin. Bi vî awayî roj, heftê û mehan di ser xwe re di-buhêrin. Di dilê wan de xwendevan ew gotara wî xwendîne. Nizanîn ku jiyana wan, bala xwendevan nakişîne û xwendevan ew gotarê wan ne xwendine. Heger xwendevan li sê rojnameyê xwe xwedî derdi-kevin, ne ji bo jiyana wan e, ni-vîskar bila bizanibin. Xwendevan li nirxê xwe xwedî derdi-kevin, xwendevan li hêviya nû-çeyen rast in, xwendevan li hêvi-ya ku bizanibin wêje, çand û pî-şeya xwe yî neteweyî lê xwedî derdi-kevin. Wê bêjin Apê Musa ji di gotarê xwe de carna qala jiyana xwe dikir. Jîna Apê Musa, liqek (şaxek) ji dîroka me bû. Apê Musa bi du' qirna ve girêda-yî bû û ji herdu qirnan hayîdar.

bû. Navneteweyî bû. De hûn bibine weke Apê Musa û xwe bi gerdûnê bidin naskirin wî çaxî wê jiyana we jî bala xwendevan bikişîne û dê bêne xwendin. Bila li me negirin, jiyana me giştan weke ya wan e. Em jî weke wan ketine girtîgehan, zindan-an, bin çavan, bin daran, çi bi serê wan de hatiye, bi serê me de jî hatiye. Herêm li gel bûye dojeh. Em tevde bi saxî di nava dojehê de ne. Ji ber vê yekê jiyana wan bala xwendevan na-kişîne. Lewre jiyana wan ji xwendevan re ne biyanî ye. Heger hûn nivîskar û huner-mend bin, tiştîn rojane, balkêş, nûjen, zanyarî û ji xwendevan re biyanî be binivîsin. Wî çaxî hûnê di çavê gel xwe de bîbi-ne hunermend û di dilê wan de bibine leheng, wê gotarê we, pirtûkîn we bêne xwendin.

Filozoferî mezîn, hozanê nemir Ehmedê Xanî gotiye:

Xanî, ji kemala bê kemalî
Meydana kemalê dîtî xalî
Yanî ne ji qabil û xebîrî
Belkî bi teasib û eşîrî

Ha... Heger hûn ji van peyvan bi rî ketibin û hûn bîbêjin, me jî meydana kemalê xalî dîtîye, tu qabilîyet û hunermendî jê re navê, bi Kurdi ye, çawa be wê bêne xwendin û firotin. Ev raman ne rast e. Ehmedê Xanî mezin e, zanyar e lê, xwe biçûk dîtîye, lê hûn biçûk in, we xwe mezin dîtîye. Na birano, gel his-yar bûye, bi peyvîn vala nayêne

xapandin. Hozanê nemir wiha didomîne:

Safî şemirand vexwarî durdî Manendê durê lisani Kurdi Inaye nîzam û intîzamê Keşaye cefa ji boyî Amê Da xelq nebêjin ku Ekrad Bê marifet in, bê esl û binyad.

Hozanê nemir Cegerxwîn di helbesta "Çûna Qonsilkhana Tirk" de wiha dibêje:

Here ezbenî, herê ezbenî
Milet hemî Kurd (şiyar) bi we dikenî.

Hûn jî dizanîn malê we ne baş e, sıfır e, sexte ye. Ji dêla xwe ve hûn gel û xwendevan tewandar dibînin. Berî her tiştî divê hûn xwe rast bikin, huner-mendîyeke we hebe pêş me bi-kîn. Wê pirtûk û kovarîn we bêne kirîn û xwendin, hûn û çapxane jî tê de naxesirin. Em jî li kirîna wan poşman nabin û bi ser de jî emê bangeşıya (propaganda) wan bikin. Kanî, ci ber-jewendiyê madî yê xwendevan hene ku li Welat, Yeni Ülke û Özgür Gündemê xwedî derdi-kevin? Ev tê vê wateyê ku ew li mirxê xwe û li rastiyê xwedî derdi-kevin.


Daxwaziya me ji nivîskaran ev e, heger mejiyê we ne yê ni-vîskaran bin û hûn negîhiştibin wê gihanekê (merhaleyê), hîna li serê sedê dev jê berdin. Na hûn vê hunermendiyê di xwe de dibînin, xwe nû bikin, tiştîn me û we bi pêş ve bibin binivîsin, sebrê bikişînin, ji bo sibê em û hûn dîsa ji hev û din fihet (fedî) nekin. Heta rojnameya Welat hebe, wê riya rexneyan ji me re vekirîbin. Li me negirin, em tu carî ne li diji zanebûn, huner-mendî, wêje, pîse û çanda nete-weyî ne. Em li diji cehaletê, di-zîyê, talanan û dilxerabiyê ne.

XAÇEPIRS

Çeþerast: 1-Sinemager, nivîskar û rewşenbirekî Kurd. Di warê sinemageriyê de, bi berhemêne xwe yên giranbuha tê nasin. Di 1984 an de li Parisê cû ser dilovaniya xwe. Di wêne de tê dîtin. 2-Bi zimanê biyanî, 'dij'/ Genetik 3-Pere/ Vexwari-nek/ Sembola Kûrçatoviyûmê 4-Qey/ Sebir/ Kolan 5-Daçek/ Maçkîrin 6-Hêz, mecal/ Cihê ku mirov pê de diçê 7-Li Ewrûpa navê rîexistinekê ku ji bo rizgariya Ìrlan'de li hember Ìngilîstanê têdikose/ Qêble 8-Qarot, sap/ Notayek 9-Kinni-visina rîexistinekê Kurd ku ji Kawa qetiya-bûn/ Naveke keçan 10-Begitî, axatî.

Serejîr: 1-Alîkarî/ Notayek 2-Pirtika pir hejmariyê/ Rehekeke (nebat) ku di meha Adarê de şin dibe 3-Celebeke şirketan/ Erd 4-Kelepor, mîras/ Nijadek 5-Ard/ Tê de nan dipije 6-Reben, evdal/ Ji bo mirovan pirsa naskirinê 7-Kinni-visina gramê/ Huner 8-Kinni-visina Amerika/ Mêrxasî 9-Nîvce, tiştî temamnebûyî 10-Baneşaneke bankirinê/ È li pêş, yeke-min 11-Naveke jinan 12-Navgîneke rîwîtiyê.

Amadekar: Rasto Zîlanî



BERSIVA XAÇEPIRSA HEFTIYA ÇÜYİ

Çeþerast: 1-Fidel Castro 2-Edülê/ Feride 3-Revoke/ Dêse 4-Mam/ Erxenî 5-Alet/ Zam/ Nêr 6-Niqotin 7-Evin 8-SS/ PGDK 9-Beka/ ADN 10-Ar/ Conta
Serejîr: 1-Fermanî/ Ba 2-Îdeali/ Ser 3-Dûmveqesk 4-Elo/ Tov/ Ac 5-Lêke/ Tip 6-Erzîngan 7-Af/ Kan/ DDT 8-Sedem/ Îkna 9-Trên 10-Risîn 11-Ode 12-Îr

QERTA ABONETIYÊ

Ji kerema xwe re ji hejmara pê ve min bikin aboneyê rojnameya Welat

Nav:

Paşnav:

Navnîşan:

Bedelê abonetiyê razînin:

Li Tirkîyê û li derive: Y. Serhat Bucak
İş Bankası Cağaloğlu Şub.

Döviz tevdiyat Hesap No: 3113617

Ji kerema xwe re vî cihî dagirin û tevlî kopyeke pelê razandina bedelê abonetiyê bişînin.

Navnîşana Welat: Başmusahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 Cağaloğlu /İstanbul

Tel (fax): 512 12 87

Mercen abonetiyê:

6 meh	Li hundir	Li derive
12 meh	120.000	60 DM

Bi zarokekî 8 salî re hevpeyvîn

Firat lawekî Kurd e. Di nava têkoşîna gelê Kurd de, rewşa konevaniya gelê Kurd û zarokên Kurd dide ber çavan. Firat, zarokekî heşt salî ye. Firat sulte ye, di sınıfa sisyan de ye. Ev hevpeyvîna jêrin belbî ji we re pîr zêde bi liserkirin bê xuyan. Belême ev hevpeyvîn bi temamî girtiye kasetê yên ku biwxazin lê guhdarî bikin em karin bi wan bîdin guhdarîkirin. Û em karin bibêjin ku tiştin jê, me hebekî sivik nîvîsin. Ji ber ku me bi xwe jî carna jê ye-qin nedikir û em şas man. Ji bo ku hûn jî şas nemîn!

Ji vê hevpeyvîna zarokî 8 salî, me ev rî pejîrand!

Firat merheba! Tu rewşa Kurdan çawa dibîn?

- İro du tişt hene ji bo Kurdan, ya wê derkevin serê çiyan yan jî wê bibin xayîn.

Kurd gişt derkevin serê çiya, îcar bajar wê jî kî re bimîn?

- È... Ez nabêjim bila gişt derkevin, ên ku karibin li bajaran bimîn, bila bimîn û tevgirêdana xwe çebikin. Komîteyan ava bikin ku karibin alîkîriya gerîla jî bikin.

Di vî şerî de divê zarok çawa bikin?

- Divê di her nûmayişê de hebin, mîna Cizîrê û Şîr-nexê.

Ê ku dê û bav ji ramana welatparêziyê dûr be, wê çawa bibe?

- İlli... Ew jî wê ji dê û bavê xwe bandor (tesîr) bigirin. Lî tiştîn ku ji hevalen xwe, ji der dora xwe û ji xwendina xwe hîn bûye, kare dê û bavê xwe jî, bixe nav têkiliyan û gava tev li nûmayisan bibe belbî bandorekî li ser dê û bavê xwe bîhèle.

Dê û bav nahêlin ku zarokên wan tiştîkî bikin...?

- Divê wan qaneh (ikna) bibe.

Ji bo ku wan qaneh bibe divê kîjan pirtûkan bixwîne?

- ...Wileh nizam. Lî divê yêñ baş bixwînin. Ji kîjanê fêr bibin ew.

Tu bi xwe ci dixwînî?

- Ci bi dest min bikevel!

Tu rojnameyan dixwînî?

- Belê, Gündem, Welat, Yeni Ülke, ji Welat bi piranî Bexçeyê Zarokan, ji Gündemê Qirix û nûçe û ji Yeni Ülke jî hew nûçeyan....

Ji bo xwendina Kurmançî...

- Ji bo xwendina Kurmançî jî, divê her Kurmancek za-



Firat, 8 salî ye

hildanî çêbîke û piştgiriya (destek) gerîla bibe.

Gerîla ci dixwaze?

- Dixwaze welat xelas bibe.

Welat (Kurdistan) ku der e? Tixûbêñ wê ji ku ta ku derê ye?

- Di navbêra Tirkîye, Iraq, Surî û Iranê de ye, hebek jî li Rûsyayê ye. Parçeyê mezin jî li Tirkîye ye.

Ji bo hîzbullah tu dikarê ci bibêjî?

- Hîzbullah tevgerek li Iraqê ye.

Li Iraqê?

- Yaw Iraq bê ku der e... Tevgerek wilô heye. Lî ya welatê me dewlet bi xwe ye. Olperestan dane hevûdu û ji wan re gotiye "Hîzbullah", nîvîyê bêhtir polîs in. Li welatê me musulmantî pîr e. Hîzbullah gelek musulman jî kuştin, weke; meleyan, sofiyan û olperesten ku ne bi wan re bûn.

Tu gelê Tirk çawa dibînî?

- Divê em bi wan re weke bira bin. Her çiqas dewleta wan zilmê li me dike jî, ev ji bo me şert e. Em yekîtiya xwe bikin ku em karibin zora dewletê bikin.

Gelê Tirk divê ci bibe?

- Ew pîrsan ji min dike, dibêje, "Tu ji kuzanî kuder Kurdistan e?" Hema ez ci bibêjî, dibêje: "Tu ji kuzanî?" Ez dibêjî ez dixwînim, dipîrsim....

Gelê Kurd divê iro ci bibe?

- Divê gel iro xwe bi çek bibe, li dijî neyar û bi taybetî jî, li dijî kontra têkoşînê bide. Komîteyan xwe damezirîne, hîzbullahan bigire.

È, ku gel nexwaze hîzbullah bigire?

- Îcar nexwaze... Qet nebe deh heb wê derkeve, deh dernekeve wê şes derkeve.

Xayîntî pîr e wê çawa bibe?

- Ev rast e. Bira, ji bo pereyan bira dikuje. Lî em komîta çebikin xayîntî wê kêm bibe.

Çima ewqas xayîntî heye, çavkaniya vê xayîntiyê ci ye?

- Ez wilo bikim ji bo ku ez sax bimînim! Neyartiyê li dijî başlyê his dike. Tu dibêjî qey neyartiyâ xwe, di vê neyartiyê de his dike.

Emê çawa karibin zora xayîntiyê bikin?

- Wek ku min beriya anoka got, bi yekîtiye.

Tu şerê gerîla çawa dibînî?

- Şerê gerîla pîr e. Lî çewtiyên wan jî pîr in. Ji ber vê xwe baş nikare bide serhevi! Ez bawer im ku xeleliyên mezin wê nema bikin.

- Li bajaran divê ci bibe?

Çawa ku gerîla ser hilda-

ye, divê li bajaran jî, gel ser-

wan re bibêjin.

Tu dibêjî kapîtalizm, kapîtalizm ci ye?

- Curekî faşizmî ye. Dixwaze dewletên her kesî ji wan bistîne, weke dewleta Tirkî ku iro tiştîn bi me dike. Ma DYA (USA) ji bo ci çû Somali? Ji bo ku wan bikuje yan bibe alîkar? Sînîa dewlemendan e. Ne ya karkevan e.

Tu kîjan mezinîn Kurdan nas dik?

- Berzanî, Telabanî, Qadî Mihamed, Şêx Seîd, Seyid Riza, Mazlum Doğan, Kemal Pîr, Hayrî Durmuş, Ferhat Kur-tay, Alî Çîçek, Mahmut Zengîn, Hakî Karer, Mahsum Korkmaz û Abdullah Öcalan...

Nîvîkarân Kurd?

- Mûsa Anter, Ehmedê Xanî, A. Durre, F.H. Sagnîc Nîvîkarân Yenî Ülke?

- Alî Firat, Yalçın Küçük, M. Anter

En Welat?

- A. Durre, M. Anter. Gündem?

- Ez kesî nas nakim. Ez berê Qirix û dû re xeberan dixwînim.

Wê gavê hebekî qırıxbûn bi tere jî heye?

- İlli... Erê hebekî.

Lî qırıx tîpek oportunist e....?

- Ez ci bikim, ne tam weke wî, lê carna ez weke wî his dikim.

Tu ji şoreşgerên dinê kê nas dik?

Qastro, Che Guevara, Ho Şî Minh, Lenîn, Stalin, Marks

Parzemînîn (kita) ku tu dizanî?

- Ez bi van tiştan pîr eleqedar nabim. (tiştîn ku nîzane jî, wiha bi qurrefî dibêje ez elaqedar nabim)

Tu li kîjan muzîkê pîr guhdarî dikî?

- Çar Stêrk, Koma Çiya û Koma Berxwedan.

Me tiştîk ji bir kir, tu hîç der heqîn jînan de nepeylî?

- Ez der heqîn jînan de napeyivim.


Çîma?

- Jîwe. (berî hevpeyvîna me henek pê kirbûn, jê re gotibûn dilketiyeke te weke qırıx heye. Ji ber vê yekî bêhna wî pîr teng bûbû û nedixwest ku der heqîn jînan de bipeviye.)

Tiştîkî ku dixwazî bibêjî heye?

- Ez biratiya gelê Kurd û Türk dixwazim.

Hevpeyvîn: 1. Xort



Hevalen min pîrsan ji min dikin, dibêjîn: "Tu ji kuzanî ku der Kurdistan e?" Ez jî dibêjî, ez dixwînim, dipîrsim...

Nameyeke vekirî ji bo evîna min

Delala min!

Bibore, ev çar sal in, ez çavêن te nabînim. Bi rastî nizanim ka çiqas mîna berê geş in an na. Ji roja em ji hevûdu dûr ketine û heyâ vê gavê, êdî ji nava nivîs û perçeyên helbesten min de gotinê nazik, çiçek û nêrgiz, ronya hîvê û bayê sibê, bar kirine. Êdî mîna berê ez bi van gotinan name û nivîsên xwe dest pê nakim. Sedem ne ew e ku, ez vê rojê ji wateya (maneya) van gotinan dûr ketime, belê niha li şuna agirê evînê, bejna dirêj û "Jîyan xwes e lê narê" li ba min termînolojiyeke din pêşketiye. Kul û derdê iro pîr cihê ne, hevala min, Mizgina min.

Evîna min! Di salen xwendinê de em sergerm bûn. Kef kîfa me bû. Şahiya dilî me tije bû. Haya me ji felekê tune bû. Me nizanibû ku evîna mezin nikare di nava dîwarên maleke biçuk de bijî. Erê me romanen evînê pîr û pîr dixwendin. Me bawer dikir ku bextewarê herî mezin, di cihanê de em in. Kul xem nexweşiyen me tune bûn. Bi saetan me dikaribû behsa evîna xwe bikira. Roja me hev nedîta, ew roj mîna sê mehîn zivistanê tarî, res û dirêj dibû.

Hevala delal!

Ez pêwist nabînim bêjim ka vê rojê li welatê me ci bûyer pêk tê. Helbet tu ji bi qasî min dizanî, ma ne ez hunerên te baş dizanî. Deref nîn e tu vê rojê ne bibî evîndara çiyayen Cudi, Gabar û Çemî Hîzilê. Êdî tu dizanî ez ci dibêjim.

Hevalê! Gundekî me tune ye. Mafê me ji hebû di nava gulên kesk û sor û zer de em desten xwe bidin hev û bi hev re helbesten evînê bixwînîn. Mafê me hebû li ber ronya hîvê di nava xewn û xeyalên evînê de noqî bibin. Lî em çawa bikin dijmin li welatê me barana napalmî dîbarîne. Heta bedewetiya çiyayen me ji tehêmûl nake û mîşeyen me ji dişewtine. We dit li Şîrnex, Pasûr (Kulp) û Gungum (Vartoyê) çawa kirin? Armanc, ji nava dilê me rakirina rehîn jîyanê ye. Li hemberî ev cendî zorî û êrişbaziya wan gelo dem peyda dibe em bayên nêrgizan li deşten xemîlandî bicînin? Na... Delala min em ewqas kor û nezan nîn in. Lî hemâ dibe mirov mîna teyrê nuama (deve kuşu) serê xwe bixe nava sîlakê (qûmê sîlik) de û bêje: Kes me nabîne. Xîret, namûs û bîranîna her hevalekî ji me re têr dike ku sed salan ji hev dûr bijîn, lî di nava kar û xebatê de bê westan herin û bê.

Li ba min dûrahiya erdnîgarî (geografi) ne tiştek e. Di navbera mirov de dikare deryayen herî mezin hebin, dikare qet derfeta hevdîtinê ji peyda nebe, lî dema ava çem û kaniyên me têkevin yek deryayekê wê çaxê problemek namîne û ew dûrahi heta dawayî ji holê radibe. Mirov dikare bi geografi pîr ji hev dûr be lî bi bîr û bawerîye, bi xebat û têkoşîna xwe tim bi hev re be.

Hevala min! Heta ji çiyayen me bîna barûdê were, wê evîna bi cu-



Wêne: Şehît M. Sabir Bekir (1985) Mêjuya şehîdbûnê: Bihar 1989, Botan

reyê salen xwendevaniye tune be. Heta em di meydanen welatêkî a-zad de, peykeren (heykelên) şehidên xwe bilind ranekin, wê dengê def û zirneye bilind nebe. Min, Sîmo, Ahmê, Mihê û Dijwar gelek plan çêkiribûn. Pîr caran me bi nîvhene û nîvrastî digot: Divê Leskeren Sor yê Komara Rojhîta Navîn hemû dîwarên li ser sînga gelan hatine avakirin hilweşînîn, hemû zindan pêwist e tenê bibin müzeyen navgînên (aletên) îşkencê. Hebûna pasaportan me tiştekî geleb eyb û paşverû didit. Belê, ez di-sa van bîr û bawerîyan diparêzim. Rastiya, ku li welatê me xwe ıspat dike ev e: Di çareserkirina her problemek de faktora herî xurt, faktora mirovan bi xwe ye. Lewma ez xiniziya hin "serokên" bi tiştekî nahesibînim, tanqîn dijmin vê rojê

eger di Zaxoyê de digerin wê sibe nikaribin ji Engerê derkevin.

Rast e me heta dereceyekê şo-reş gelekî romantik didit, me digot belki radikalizm tenê parastina teoriyên radikal e, lî hesabê malê û çarşiyê nabe yek. Me zû xwe nas kir, me zû xwe bi riya serxebûnê ve girêda û bi destê Mamosteyê mezin Serok APO em hatin necrandin, kesaniya me ji nû ve hate vejandin û em têgihiştin ku radikalizm di nava karvaniye (pratikê) de bi kar anîna tişten rast e.

Hevala delal! Tê bîra te sofîyen Moskov yê rûreş, zigurd û serse-riyên ku ticareta siyasetê dikirin êriş ser me dikirin? Tê bîra te xwe dikirin ebûqatên Brejnev, bi serê Honeker sond dixwarin? Em gêj dikirin digotin me hûn Trostekî ne, Mawîst in û dijminen berjewendiyen

(manfaten) sosyalizmê ne û hwd. Lî (ellhemdülillah) niha ev cure gotubêj tune ne. Cihê wan mirovan ne li erdê û ne ji li ezmanan nemaye. Hin-nek namûs bi wan re hebe, wê pozê wan ji xwîna şehîdan bîşewîte, wê xwe bavêjin bextê milet û hêviya efükirinê bixwazin. Eger a-qilîn xwe bînîn serê xwe baş e. Ri-ya wan di nav taristana goristanê re derbas dibe.

Hêviya min eşkere ye. Em neçar in bi demê re xwe hîn xurt bikin. Dîsa dixwazim vê rastiyê ducarî bi-kim, nêzîkbûn rihê mirovan ji hev ji nêzîkbûna bawerîyen wan tê. Heta ez te li gora salen xwendinê nas di-kim wê di dilê min de, rîz û evîna te tije be. Tirsa min ji tişkekî nîn e. Lî mirov bi rastî û eşkere deng bike çêtir e. Baş e? Li derdorê te gelek zorî hene ev rastiyek e, lî mirovên

çê ew in ku di nava rewşen xerab de, xwe diparêzin û li dijî her zoriyê li ber xwe bidin.

Hevala delal! Bibore ez neçar im di nivîsên wiha de behsa pirsan bikim. Ez ci bikim ma qey gemiyê min hene behs bikim? Yan ji jiyanê ke din ya min heye binivîsim. Na. Ez bawer dikim tu min baş fêm dikî. Eger tu ya berê yî, wê çaxê navnîşana min li ba we heye. Navnîşana min tenê sê tipen rîzkir ne û li herderê ji peyda dibe. Bi rastî demeke wiha peyda nebûye, ez bi şexsî pîrsa te bikim. Tenê dikarim saet bi saet pîrsen têkoşînê winda û ne zelal tune ye.

Hevala min! Eger tu girêdayê wan hersê tipen (harf) navnîşana min bî, eger tu, girêdayê biranîna şehîdan bî, wê çaxê xwe xurt bike, bila nûşeyen te yên baş bîghêjine me. Her rojekê em wida bikin zi-yaneke mezin e. Lewma pêwist e dilê te ji her girêdanê feodal xurt-tir be. Pêwist e tu xwe ji qeyd û bendan rizgar bikî. Ez we nas dikim. Nebêje ez tenê me. Bila çavân te li Bêrivan, Rûken û Dicle bin. Berxwedan jiyan e û kolefî mirina her roj e. Li ber xwe bide û tif bike rûye tirsonek, sextekar û ziman-dirêjan ci dema xeber bêne, bêjin. Mizgina te di riya şoreşê de dimeşê. Wê çaxê ezê bêjim: Ci dema xeber bêne bêjin. Mizgina te di riya şoreşê de dimeşê. Wê çaxê ezê bêjim: Gelo dibe rojekê dengê def û zirneya Kurmançî heft roj û heft şevan bi ser çiyayen Kurdistanê bîkeve û di bin ala rengin de, goven-deke mezin û dirêj were gerandin.

Bimeşê! Dem dema girêdanê feodal û mayîna di nava çar dîwan de nîn e.

Hevala Delal! Tu problemen min yên şexsî tune ne. Ez tenê difi-kirim çawa dikarim layiqê Partiyê, Seroktiyê bibim. Birca Belek, Pira Baft, Xeydayê, Medresa Sor û Gorâ Mem û Zîne ji nûve ava bikim. Erê heta kevirên van cih û waren pîroz li ber ava dikevin, heta ba li van kavilan dixe, bi cureyê romanen evînê ez nikarim ji te hez bikim. Hêviya min e di Newala Qesabon (Goristan Netewî ya Şehîden Kurdistanê, li serbingeha bîryarê Kongreya 4'an ya PKK) de, ez peykerê leşkerê Neniyas (meçhûl esker) ava bikim û ci dema Serok rîbahê wî projeyê biqtine û qevdek gulên rengin dane ber agirê şehîdan, pişti wê ezê bikaribim banî te bikim: Were havala min Mizgina min.

De haydê, li hêviya qerarên baş û xeberên we yên xweş im. Bibore, ez di dawiyê di bêjim eger bawerîyen te yên iroyîn bi gotinê min re cuda bin, di nava nakokiyê de bin, hêvi dîkim tu navê min ji, ji bîr bikî. Dîrok wê rastiya her mirovê deye holê.

Dîsa bi hêviya tişten qenc ji bo we û hemû hevalan gelek rîz û silavîn şoreşeri. Bi xatirê we.

Zerdeş Hemka/Paris

- Li ser navê İMC Basın-Yayın Ltd. Şti. (adına) Xwedî (Sahibi) Zübeyir Aydar
- Berpirsiyare Giştî (Genel Yayın Yönetmeni) Abdullah Keskin • Berpirsiyare Nivîsaran (Yazı İşleri Müdürü) Mazhar Günbat
- Navnîşan (Adres) Başmüsahip Sok. Talas Han 16 Kat:3 No:301 • Tel (fax) 512 12 87
- Berpirsiyariya Ewrûpa • Postfach: 1531, 5300 Bonn 1, Germany • Tel: (49) 228-630990 • Fax: (49) 228-630715
- Berpirsiyariya Fransa: Amed Jemo • Rue G-401 92763 Antony Cedex France
- Çapkirin (Baskı) Metinler Matbaacılık • Belavkirin (Dağıtım) Birleşik Basın Dağıtım AŞ